# BIRAYÊMIN!

## Werin Îslâmê


Ebû Sehran Es-Sûrî

Wergêr: Osman Sadıkoğlu



teuhid

BASIM YAYIN

# BIRAYÊMIN!

Werin Îslâmê

Ebû Sehran Es-Sûrî

Wergêr: Osman Sadıkoğlu

teuhid
BASIM YAYIN

www.tevhiddersleri.tv
www.tevhiddergisi.net
tevhiddergisi@gmail.com

**BIRAYÊMIN! Werin Îslâmê**

**Wergêr** **:** Osman Sadıkoğlu

**Edîtor** **:** Tevhid Basım Yayın, 42546

**Teshîh** **:** Tevhid Basım Yayın

**Weşan** **:** Tevhid Basım Yayın

**Çapa Yekem:** 2019, Stembol

**Çapxane** **:** Şenyıldız Matbaacılık, 11964

**ISBN** **:** 978-605-68965-4-5

**Cihên Temînê: Pirtukxaneya Tevhid NÛNERÎYÊN ME**

**İstanbul** : Kirazlı Mh. Mahmutbey Cd. No: 120/A 34212 Bağcılar/İSTANBUL 0 545 762 15 15

**Ankara** : Kazım Karabekir Mh. 2061. Sk. No: 18 06794 Etimesgut/ANKARA 0 543 225 50 48

**Diyarbakır** : Kaynartepe Mh. Gürsel Cd. No: 90/A 21090 Bağlar/DİYARBAKIR 0 543 225 50 43

**Konya** : Mengene Mh. Büyük Kumköprü Cd. No:78/A 42020 Karatay/KONYA 0 543 225 50 49

**Van** : Vali Mithatbey Mh. Koçibey Cd. Armoni İş Mer. No: 14/D 65100 İpekyolu/VAN 0543 225 50 45

# PÊŞGOTIN

Rêbazên/metodên Rojavahî û Rojavaparêzyên ku di nav war û welatên îslamê de tên tetbîq kirin her tim ev e: *“Pêşî Ser Dipeke, Piştre Govde Dikeve!”*

Li gorî wan Ser: Ew bîr û bawerîya Tewhîdê ye ku ji bo her ferdê ûmmeta îslamê re dustûr û nasname ye. Belê ew dijminên îslamê pir qenc dizanin dê ev Serê pîroz çawan bipeke da ku ew govdeya herî mezin (ûmmeta îslamê) jî bipelişe û dakeve.

Di vê nuqtê de, meseleyekî pir muhîm jî ev e ku; hin kesên salên xwe di mekteb û medreseyan de borandine lê ji hêla bîr û bawerîyê ve warisê Bel’am b. Baûra ne, bi xebat û xizmetên xwe hevkarîya Rojavahîyan û paletîya îdeolojîyên wan dikin ku şeş payê fikr û ramanên wan berevaja/tersê aqîda tewhîdê û heq û mafên ûmmeta îslamê ye.

Ew bîr û bawerîya tewhîdê ku bingeh û esasa îslamê ye, ji bo ku qismî an jî bi tevahî tehrîf bikin, an hûkmên wê betal bikin an jî heqîqeta wê bi tiştên din re bigûherînin, bi temamê hêzên xwe liber xwe didin.

Di serekatîya Bel'amên zeman de rûvegerîya gel ji aqîda tewhîdê û ji sûnneta Rasûlûllah *aleyhîssalatûwesselam* tews û lez girt. Di vê rewşê de di nav xelkê de jî kompleks, yanê girêcaneke hîsnizmî belav û bicih bû. Ew ên ku ji vê ehwalê herî zêde bandor/tesîr li wan hatîye kirin, yanê ji vê rewşê mûteessîr bûne jî, xort û ciwanên me ne.

Di vê dewrê de bi taybetî li welatên îslamê keşmekeş û sêlûbelek a berfireh hakimê jîyanê ye. Herwiha dîplome û îcazetname zêde dibin, lê tevî vê yekê di maneya şer'î de *'cahiltî'* jî zêde û belav dibe. Roj bi roj ev çembera pelişandinê tengtir dibe. Perdeyên ku li ber çav û qelban hatîye kişandin, bilxese li ser xort û ciwanan rê û rêbazên xeyrî şer'î xweferz dike, xwe disepîne. Di vê çarçovê de em dikarin bêjin ku halê ciwanên me ji hêla bawerî û exlaq û terza heyatê ve, haleke dilsotînerî ye, haleke trajîk e. Ev menzereyên

hanê em dikarin bêjin di umumê war û welatên îslamê de li ber çav xûya ye.

Em vîya qenc bizanibin ku ew cotyarê genim çandibî; ne ceh, wê dîsa genim hilîne, genim rake. Ew xort û zarokê di malbateke edilî de gihabe, eger carinan wek pelê payîzê vir de wir de bigevize jî, di encamê de ew ê dîsa vegere ser eyarên xwe yê fitrî -biiznîllah-. Ji bo vê jî lazime ku serê kanîyê zelâl be!

Divê ku dê û bav, ji hêla bîr û bawerîya tewhîdê de û di îttibaa sunneta Rasûlûllah *aleyhîssalatûwesselam* de û di exlaqê xweş de û mînakbûna di kesayetîya xwe yê îslamî de, bikurtahî di her mijarên heq û qencîyê de ji bo zarokên xwe bibin model û mîsal.

Zelâlbûna serê kanîyê jî ev bixwe ye.

Hin alimên ji ûlemayên dewrên berê wiha gotine: Birastî însan, sır û xûlasayê bavê xwe ye.

Nesleke salih û di heman demê de jî mûslih, bialîkarîya Allah *azze we celle* enceq bi destê ebeweynên ku qelbê wan mûteweccihê razîbûna Allah *azze we celle* û di kar û kirinên xwe de jî

mûttebîê sunneta Rasûlûllah *aleyhîssalatûwesselam* in dê derkeve holê. Em hêvî û dûayên xwe jî kêm nakin, lê li ser me hemûyan wacib e ku em di heman demê de serê kanîyê ji şêlotî û ji gemarîyê paqij bikin.

Ev berhema ha, di vê mijarê de wê nêrineke nû bide xwendevanê xwe û belkî konfora zihnê xwendevan xera bike û tesîreke hejîner lê bike.

Em jî wek Tevhîd Basım Yayın hêvîdar in ku ev tesîr nêrîna xwendevanan zelal bike û ji bo wan pir bi feyde be.

***Wergêr***
***(Osman Sadıkoğlu)***

بســـم الله الرحمن الرحيم

## JI BO BEXTEWARÎYA BÊDAWÎ BANGEKE TEWHÎDÎ!

Ez ji Allahê ku Rabbê Îbrahîm û Al-î Îmran e û ji xeynî wî tu îlah tuneye, jê re hemd dikim û dest bi gotina xwe dikim.

Ji ezel heta ebed hemd û pesindan ji Allah *azze we celle* re ye. Salât û selamên herî xweşik û mûbarek li ser Rasûlullah û malbata wî yên tahir û eshabên wî yên birûmet be.

Birayêminê hêja!

Hamdê bê hed ji Hâkimê hâkimân re ku ew e rayedarê yekane yê li ser heyata me. Ew e, ê ku wê me bimirîne û carekî din bivejîne. Ê kû em xuliqandiye û heyata me didomîne û razîqê hemû mexluqatan e.

Ji bo derfet (fersend) da ku min te di van rêzên pirtûka xwe de kirîye mêvan dîsa hemd jî Allah re be.

Bi wesîla van rêzan tu bi xêr hatî navbera me. Ji bo xatirê em ji axê hatine xuliqandin ezê bi banga *“tu”* bangi te bikim. Ji bo xatirê biratiya me yê ku ji yek dayik û bavê jî ezê ji te re bêjim *“birayê min”*.

Ez bawerim bi van bangân ku ez bangî te bikim wê qet zirar tûne be. Bi vê ramanê ez dest bi rêzên xwe dikim.

Ezê van rêzan weke ku em bi hev re suhbetê dikin binivîsim. Tiştên ku di dilêmin de heye ez dixwazim tu jî jê payedar bibî. Ez bi daxwazîya razîbûna Allah *azze we celle* dinivîsim. Rabbê min qebul bike! Allahumme amin!

Ez ve pirtûkê ne ji bo dilê te bişkînim, an te rencîde bikim an jî ji bo tu bibî êzingê cehennemê bi navê *“kafir”* te binav bikim dinivîsim. Dîsa ez vê pirtûkê ne ji bo xeyalên ku tu bi wana dilê xwe xweş bikî dinivîsim. Tevlî gunehên te yên bi zanîn an bi nezanin, amelên şirk ku te kirine, niyeta te niyeta ehlê cennetê jî be heta tu li ser amelên ehlê cehennemê berdewam bikî ez nikarim bi navê *“Muslîm”* bangi te bikim û te wek warisekî cennetê nîşan bidim.

Van tiştên ku ez li vê derê binivîsim dixwazim hin heqîqetên ku te ji bîr kirine ji nûde bînî bira xwe. Hin tiştên ku tu nizanî ez wana bi te bidim zanîn û tiştên dizanî jî cardi ji te re tekrar bikim.

Hêviya min ji Allah *azze we celle* ev e ku; ev nivîsên min bibe wesîle ku tu bigihîjî cennetê û ji bo deriyên cennetê vebin bibe mifte ji te re. Digel vê yekê derîyên cehennemê jî ji te re qufîl bibin û bêdawî venebin, înşaallah.

Tu jî qenc dizanî ku her dêriyên qufîlkirî li menzelên ku tiştên pir hêja dagirtî ne re vedibin. Her tiştên hêja tên parastîn û ser wan jî tên qufilkirin. Kîjan xezîne bê qufîl û bê parastin li holê hatiye reşandin ku derîyên cennetê bê qufîl bimînin?

Ka bifikre, çima malê Allah *azze we celle* bê qufîl û bê parastîn bimîne? Ya rastî; xezîneyên Allah azze we celle ji temamên milkân û xezîneyân zêdetir hêjaye û bi rûmet û bi qîmet e.

Cennet...

Bi te, ev malên pir hêja û bêheval ne çêtir layiqe ku bê parastin û qufîlkirin?

Cennet...

Qey qasî ku derîyên xwe ji herkesî re veke bê bûhaye?

Wekî ez dengê te dibihîzim ku tu dibejî *“helbet ne wisan ye”*. Belê tu ji bo vekirina devika vê xezînê û derîyên vê welatê hêja heyî? Ji bo cewabekî ji dil *“herê ez ji heme!”* bersiv bidi vê pirsa min divê tu vê xişir û xezîneya bi xişirê dagirtî ye qenc bizanibi û nasbikî.

Ez hinek behsa vê xezîneyê bikim da ku canê te jê re meftûn bibe û îştaha te lê vebe.

Lewre cennet xezîneyeke wisane ku ne kelîmeyên min ji naskirina wê re têr dikin û ne jî ez ji bo naskirin û vegotina cennetê re rayedar im.

Ger terîfa tiştekî bê kirin terîfa wê tiştê ya herî baş enceq xwediyê wî bikaribe bike. Nexwe ji bo naskirina cennetê em jî kêlîkî guhên xwe bidin xwediyê cennetê.

Binêre û guh bidê, çawa terîf dike yê ku wê cennetê xuliqandiye *azze we celle*:

إِنَّ الْمُتَّقِينَ فِي جَنَّاتٍ وَنَعِيمٍ ﴿٧١﴾ فَاكِهِينَ بِمَا آتَاهُمْ رَبُّهُمْ وَوَقَاهُمْ رَبُّهُمْ
عَذَابَ الْجَحِيمِ ﴿٨١﴾ كُلُوا وَاشْرَبُوا هَنِيئًا بِمَا كُنتُمْ تَعْمَلُونَ ﴿٩١﴾ مُتَّكِئِينَ
عَلَى سُرُرٍ مَّصْفُوفَةٍ وَزَوَّجْنَاهُم بِحُورٍ عِينٍ ﴿٠٢﴾ وَالَّذِينَ آمَنُوا وَاتَّبَعَتْهُمْ
ذُرِّيَّتُهُم بِإِيمَانٍ أَلْحَقْنَا بِهِمْ ذُرِّيَّتَهُمْ وَمَا أَلَتْنَاهُم مِّنْ عَمَلِهِم مِّن شَيْءٍ كُلُّ
امْرِئٍ بِمَا كَسَبَ رَهِينٌ ﴿١٢﴾ وَأَمْدَدْنَاهُم بِفَاكِهَةٍ وَلَحْمٍ مِّمَّا يَشْتَهُونَ ﴿٢٢﴾
يَتَنَازَعُونَ فِيهَا كَأْسًا لَّا لَغْوٌ فِيهَا وَلَا تَأْثِيمٌ ﴿٣٢﴾ وَيَطُوفُ عَلَيْهِمْ غِلْمَانٌ لَّهُمْ
كَأَنَّهُمْ لُؤْلُؤٌ مَّكْنُونٌ ﴿٤٢﴾ وَأَقْبَلَ بَعْضُهُمْ عَلَى بَعْضٍ يَتَسَاءلُونَ ﴿٥٢﴾ قَالُوا
إِنَّا كُنَّا قَبْلُ فِي أَهْلِنَا مُشْفِقِينَ ﴿٦٢﴾ فَمَنَّ اللَّهُ عَلَيْنَا وَوَقَانَا عَذَابَ السَّمُومِ
﴿٧٢﴾ إِنَّا كُنَّا مِن قَبْلُ نَدْعُوهُ إِنَّهُ هُوَ الْبَرُّ الرَّحِيمُ ﴿٨٢﴾

*“Bêşik kesên mutteqî di nav cennetan û nî’metan de ne.*

*Bi tiştê ku rabbê wan daye wan, kêf û sefayê dikin. Rabbê wan, ew ji ezabê cehennemê parastine.*

*Ji ber kar û kirinên xwe, bi noşîcanî bixwin û vexwin.*

*Li ser textên rêz bi rêz hatine rêzkirî paldayî ne. Me ew bi hûrîyên çavxezal re zewicandine.*

*Ew ên ku îman anîne û zuriyeta wan jî bi bawerî dane pey wan; me zuriyeta wan jî xiste*

*nav wan û em ji amelên wan jî tiştekî kêm nakin. Herkes li hember keda xwe de rehîn e.*

*Ji fêkî û goştê ku dilê wan dibijîye me da wan.*

*Ew tê de qedehên xwe ji dest hev digirin, di wê (meyê) de ne axaftineke kelevajî, ne jî tê de gunehkarî (serxweşbûn) heye.*

*Li ber destên wan xortên nâzenîn ji bo xizmetê digerin, her wekî ew dûrrên di sedefên xwe de veşartî ne.*

*Ew berê xwe didin hev û (rewşa xwe ya li dinyayê) ji hev dipirsin.*

*Dibêjin: "Birastî em li dinyayê di nav malbata xwe de (ji ezabê ilahî) bitirs bûn.*

*Allah kerem li me kir û em ji ezabê semûm parastin.*

*Birastî em li dinyayê lavekarê Allah bûn. Lewre ew xwedikerem û Rehîm e"*

مَثَلُ الْجَنَّةِ الَّتِي وُعِدَ الْمُتَّقُونَ فِيهَا أَنْهَارٌ مِّن مَّاء غَيْرِ آسِنٍ وَأَنْهَارٌ مِن لَّبَنٍ لَّمْ يَتَغَيَّرْ طَعْمُهُ وَأَنْهَارٌ مِّنْ خَمْرٍ لَّذَّةٍ لِّلشَّارِبِينَ وَأَنْهَارٌ مِّنْ عَسَلٍ مُّصَفًّى وَلَهُمْ فِيهَا مِن كُلِّ الثَّمَرَاتِ وَمَغْفِرَةٌ مِّن رَّبِّهِمْ كَمَنْ هُوَ خَالِدٌ فِي النَّارِ وَسُقُوا مَاء حَمِيمًا فَقَطَّعَ أَمْعَاءهُمْ ﴿٥١﴾

*“Rewşa wê cenneta ku ji mutteqîyan re hatiye wead kirin wiha ye: ‘Di nav de çem henin ku ava wan xera nabe, tê de çemên ji şîr hene ku tehma wî nayê guhartin, tê de çemên ji şeraban hene ku ji yên wedixwîn re bi tahme, tê de çemên ji hingivên helandî yên sefandî hene û tê de ji bo wan her çeşît fêki hene. Û ji cem Rabbê wan ji bo wan lêborinek/mexfîretek heye. Rewşa wan get dibe wekî wî kesê ku bêdawî di agirê cehennemê de bimîne û bi aveke kelijî bête avdan ku rûvîyên wî piçik û parî dike?”*

Allah *azze we celle* di ayetên din de danasîna cennetê wiha didomîne.

إِنَّ الْأَبْرَارَ يَشْرَبُونَ مِن كَأْسٍ كَانَ مِزَاجُهَا كَافُورًا ﴿٥﴾

*“Birastî mirovên qenc ji qadeheke ku kafûr tevlî wê bûye dê vexwin*

عَيْنًا يَشْرَبُ بِهَا عِبَادُ اللَّهِ يُفَجِّرُونَهَا تَفْجِيرًا ﴿٦﴾

*Ev çavkanîya wisan e ku evdên Allah jê vedixwin û devera bixwazin bi wê ve diherikînin*

يُوفُونَ بِالنَّذْرِ وَيَخَافُونَ يَوْمًا كَانَ شَرُّهُ مُسْتَطِيرًا ﴿٧﴾

*Ew evd in ku soz û ehdên xwe tînin cih û ji rojeke wisan ditirsin ku kes ji şerê wê ne emîn e.*

وَيُطْعِمُونَ الطَّعَامَ عَلَى حُبِّهِ مِسْكِينًا وَيَتِيمًا وَأَسِيرًا ﴿٨﴾

*Ew xwarina ku ihtîyacîya wan pê heye û hez jê dikin, didin feqîr û sêwî û êsîran.*

إِنَّمَا نُطْعِمُكُمْ لِوَجْهِ اللَّهِ لَا نُرِيدُ مِنكُمْ جَزَاء وَلَا شُكُورًا ﴿٩﴾

*Em bitenê ji bo razîbuna Allah xwarinê didin we, em ji we tu heqekê û tu spasîyekî naxwazin.*

إِنَّا نَخَافُ مِن رَّبِّنَا يَوْمًا عَبُوسًا قَمْطَرِيرًا ﴿٠١﴾

*Lewre em, di rojeke dijwar û asê de ji Rabbê xwe ditirsin.*

فَوَقَاهُمُ اللَّهُ شَرَّ ذَلِكَ الْيَوْمِ وَلَقَّاهُمْ نَضْرَةً وَسُرُورًا ﴿١١﴾

*Allah jî, wana ji xerabîya wê rojê diparêze, rûgeşî û dilşadî dide wan.*

وَجَزَاهُم بِمَا صَبَرُوا جَنَّةً وَحَرِيرًا ﴿٢١﴾

*Li beramberê sebra wan ew bi cennettekî û bi libasên hevrîşim hatine xelatkirin.*

مُتَّكِئِينَ فِيهَا عَلَى الْأَرَائِكِ لَا يَرَوْنَ فِيهَا شَمْسًا وَلَ زَمْهَرِيرًا ﴿٣١﴾

*Di cennetê de li ser textan paldayî ne, tê de ne germê dibînin, ne jî sermayê.*

وَدَانِيَةً عَلَيْهِمْ ظِلَالُهَا وَذُلِّلَتْ قُطُوفُهَا تَذْلِيلًا ﴿٤١﴾

*Sîya (darên) cennetê bi ser wan de nizim dibe û fekîyên wan jî li pêşîya wan raxistî ne.*

وَيُطَافُ عَلَيْهِم بِآنِيَةٍ مِّن فِضَّةٍ وَأَكْوَابٍ كَانَتْ قَوَارِيرَا ﴿١٥﴾

*Li ber wan kaseyên zîvî û qadehên billûr tên gerandin.*

قَوَارِيرَ مِن فِضَّةٍ قَدَّرُوهَا تَقْدِيرًا ﴿١٦﴾

*Ew qadehên ji zîvê ku wan li gorî dilên xwe pîvane.*

وَيُسْقَوْنَ فِيهَا كَأْسًا كَانَ مِزَاجُهَا زَنجَبِيلًا ﴿١٧﴾

*Ji wan re qedeheke dagirtî tê peşkeşkirin ku zencefîl di navê de heye.*

عَيْنًا فِيهَا تُسَمَّى سَلْسَبِيلًا ﴿١٨﴾

*Tê de kanîyek (heye) ku navê wê: 'Selsebil' e.*

وَيَطُوفُ عَلَيْهِمْ وِلْدَانٌ مُّخَلَّدُونَ إِذَا رَأَيْتَهُمْ حَسِبْتَهُمْ لُؤْلُؤًا مَّنثُورًا ﴿١٩﴾

*Xizmetkarên bê mirin li dora wan digerin, dema tu wan dibînî tu dibêjî qey ew dûrren belavbûyî ne.*

وَإِذَا رَأَيْتَ ثَمَّ رَأَيْتَ نَعِيمًا وَمُلْكًا كَبِيرًا ﴿٢٠﴾

*Dema tu lê dinêrî tu li wîr dibinî ku nî'met û milkekî pir mezin heye.*

عَالِيَهُمْ ثِيَابُ سُندُسٍ خُضْرٌ وَإِسْتَبْرَقٌ وَحُلُّوا أَسَاوِرَ مِن فِضَّةٍ وَسَقَاهُمْ رَبُّهُمْ شَرَابًا طَهُورًا ﴿٢١﴾

*Li ser wan cil û libasên ji hevrîşima kesk û atlasên hur neqişandî hene. Bi bazinên zîvî hatine xemilandin. Rabbê wan vexwarinên paqij bi wan daye vexwarin.*

إِنَّ هَذَا كَانَ لَكُمْ جَزَاء وَكَانَ سَعْيُكُم مَّشْكُورًا ﴿٢٢﴾

*(ji wan re tê gotin): Bi rastî ha ev mûkâfata we ye. Xebata we hatiye şêkirandin."*

Sûbhanallah...

Tu çi qas mezinî ya Rehman!

Temamê kelam û qalem ji bo ku mezinahîya te bînin ser ziman aciz dimînin bêguman. Fedîkirina min ne ji acizîya min e; ji vê sedemê ye ku min bi pêdîvî hemd û pesinandina te nekiriye.

Birayêmin.

Evan bitenê dilopekî ji wê war û welatên herî paqij û tahir e.

Te seh kir, ne wisan!

Çi heye li wê mekanê û çi tûne. Her tiştên ku tu li wan digerî.

Her tiştên ji bo te li wê derê heye ku li vê dinyayê tu xwe dirêjî wan dikî jî nikarî bigirî.

Binêre ezê ji te re çi bêjim?

Gotina rastî di himbêza rastîyê de ye. Heydê niha jî bi dilê min bigire. Em biçin warê wî yê ku wê me pîrûpâk bike...

Emê biçin ku derê?

Gava em çûn wê tu yê bibînî!

Va em hatin, te dit?

Li ber vê derîyê parêzger û mihafiz tune! Sitandina randevu û bendemayîna bi seatan tune. Qey tu lihêvî bimînî wê çibe? Ne yek ûmrek, hezar ûmir lihêvîyê bimînî lê belê carek tenê li te bikene û bi beşeke ji dilucân beje:

*"Tu bi xer hati biraye min!"* ma ne hêja ye ku sed sal jî li hêviyê bimînî?

Lê belê ji vê re hewce nîne. Bitenê dengê xwe li ser dengê wî bilindtir dernexe. Dema ku wî der barê tiştekî de hûkmê xwe danî tu bibêje:

*"Min seh kir û îteat kir!"*

Dema te ev got berê ku tu ûmrê xwe li ber vê derîyê biqedînî wê tu bersiva silavê xwe bi xweşik bistînî li vê warê.

Belê, em niha li hemberê yek tiştekî ne. Ev tişt ji wan tiştan e ku te ji bîr kirîye. Di hizûra Nebi yê pîroz *aleyhîssalatûwesselam* ku rahmeten lil alemîn e. Niha ez sikût dikim. Bila ew ji te re bêje. Min ji te re got ku kelîmê min ji danasîna wî re têr nake. Îdraqa min têrî femkirina wî tune. Lê belê binêre seyyidê Fîrdewsê çi xweşik behsa cennetê dike. Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* wîha ferman dike:

*“Ma tu kes tune ku ji bo cennetê zendikên xwe biçikine? Çimkî ew cennet bê mîsal û bê heval e. Sond bi Rabbê Kâ’beyê ku ew; nûrek e ku dibariqe... Hêşînahîyeke bêhnxweş û pêldar e... Qesrekî bilindbuyî ye... Çemek e ku bi şireşir diherike... Fêkiyên xweş û gihayî... Hevala xweşik û nazenîn... Cil û libasên cûrbicûr... War û welatê çavkanîya saxîtî û bi silametîyeke gelek birûmet e, di cihekî bêdawî di nav fêki û heşînahî û ni’metan û kêf û xweşîyê de ye.”*

Te bihîst ne wisan birayêmin?

Dilê te jî seh kir?

Xweşikbûna wan meqaman te hes kir? Ger te qenc hes nekiribe bisekine, ji van rêzan derbas nebe. Hinek din jî bixwîne, hinek din jî zorê bide îdraqa xwe...

*"Dema ew kesên cennetî ne dikevin cennetê, Allah* azze we celle *vê pirsê ji wan dike:*

*'Tu daxwazîya we ji min heye ku ez bidim we?'*

*Kesên ehlê cennetê wiha bersiv didin:*

*'- Ya Rabbê me! Te rûyê me spî derxist, em ji ezabê cehennemê xelas kir û me xiste cennetê. Emê hêj çi bixwazin?'*

*Li ser vê yekê Allah* azze we celle *perdeya çavên ehlê cennetê râdike û bi vê awayê xelat û ni'meta herî mezin dide wan. Ev xelata herî mezin jî, ji wan re dîtin û seyra cemalullah e."*

Sûbhanallah!

Te seh kir ne wisan?

Êdî tiştê herî bûha lênêrîna zâtê aqdes e, seyra zâtê Rehman e.

Di vê gavê de ew cenneta ku ez ji danasîn û îdraqa wê de aciz mabûm ew cenneta xweşik winda dibe û bitenê zatê Rehman dimîne di dil de. Ya rastî însan di vê halê de bi nezanîn û şaşîtî dîsa wiha dibêje:

*"Ya Rabbê me! Te rûyê me spi derxist, em ji ezabê cehennemê xelas kir û me xiste cennetê. Hêj emê çi bixwazin?"*

Eve bi qasî ku ez ji te re bikaribim terîf û neqla cennetê bikim ewqas e. Lê belê weke tu jî dizanî Qur'ana pîroz ji me re behsa cennetê dike û paşi jî vegotina cehennemê tîne ser ziman ku em ahenga xewf û omîdê, tirs û hêvîyê bikaribin pêk bînin. Lewra abdîtî enceq bi van her dû zîyneta bê xemilandin, meqbûl bibe û bigihîne eslê xwe.

Tu dixwazî niha jî em hinek behsa cehennemê bikin. Bi vê awayê ew dilê te yê zahf kişîya cennetê hinek jî bi tirsa cehennemê qawî bibe û bê perçinkirin, înşaallah. Em dîsa gûhdarê fermanên Allah *azze we celle* bibin ku wî *azze we celle* rahmet li ser xwe nivîsîye û digel vê yekê ezabê wî jî heq e. Ji me re cehennemê wisan dinasîne:

وَيْلٌ يوْمَئِذٍ لِّلْمُكَذِّبِينَ ﴿٨٢﴾ انطَلِقُوا إِلَى مَا كُنتُم بِهِ تُكَذِّبُونَ ﴿٩٢﴾ انطَلِقُوا
إِلَى ظِلٍّ ذِي ثَلَاثِ شُعَبٍ ﴿٠٣﴾ لَا ظَلِيلٍ وَلَا يُغْنِي مِنَ اللَّهَبِ ﴿١٣﴾ إِنَّهَا
تَرْمِي بِشَرَرٍ كَالْقَصْرِ ﴿٢٣﴾ كَأَنَّهُ جِمَالَتٌ صُفْرٌ ﴿٣٣﴾ وَيْلٌ يَوْمَئِذٍ لِّلْمُكَذِّبِينَ
﴿٤٣﴾ هَذَا يَوْمُ لَا يَنطِقُونَ ﴿٥٣﴾ وَلَا يُؤْذَنُ لَهُمْ فَيَعْتَذِرُونَ ﴿٦٣﴾ وَيْلٌ
يَوْمَئِذٍ لِّلْمُكَذِّبِينَ ﴿٧٣﴾ وَيْلٌ يَوْمَئِذٍ لِّلْمُكَذِّبِينَ ﴿٠٤﴾

*“Wê rojê weyl li halê ew ên mûkezzib in (ew ên derew hesab dikin).*

*(Wê rojê ji kafiran re tê gotin:) Ber bi wê ezabê ve ku we derew hesab dikir de herin.*

*Bi bal sîya sê şax ve biçin.*

*Ber bi wê sîya ku qet hênikahî nade û ji agir jî naparêze (Ber bi wê ve herin).*

*Ew (cehennem) çirûskên mezin wekî qesran davêje.*

*Tu dibêjî qey her yekî ji wan wek garana deveyên zer ên lok (nêr) in.*

*Wê rojê weyl li halê ew ên mûkezzib in (ew ên derew hesab dikin).*

*Ew, rojek e ku nikarin bipeyivin (Xeber bidin, biştexlin).*

*Ji wan re destûr jî nayê dayin ku lêborîna xwe bixwazin, ûzir beyan bikin.*

*Wê rojê weyl li halê ew ên mûkezzib in (ew ên derew hesab dikin).*

*Îro roja ji hev veqetandinê (feslê-hukmê) ye. Me hûn û yên berî we civandin.*

*Eger hîle û pîlanên we hene; êdî hîle û pîlanên xwe li min bikin*

*Wê rojê weyl li halê êw ên mûkezzib in (ew ên derew hesab dikin).”*

Ayetekî din:

وَقُلِ الْحَقُّ مِن رَّبِّكُمْ فَمَن شَاء فَلْيُؤْمِن وَمَن شَاء فَلْيَكْفُرْ إِنَّا أَعْتَدْنَا لِلظَّالِمِينَ نَارًا أَحَاطَ بِهِمْ سُرَادِقُهَا وَإِن يَسْتَغِيثُوا يُغَاثُوا بِمَاء كَالْمُهْلِ يَشْوِي الْوُجُوهَ بِئْسَ الشَّرَابُ وَسَاءتْ مُرْتَفَقًا ﴿٢٩﴾

*“(Ya Muhammed) Tu bêje: ‘(Ev Qur’an) heq e, ji cem Rabbê we ye.’ Êdî kî dixwaze bila bawer bike û kî jî dixwaze bila înkar bike. Bêguman me ji zaliman re agirekî wisan amade kiriye ku dîwarên wê hawîrdor li wan girtiye. Eger alîkarîyê bixwazin wê bi aveke weke madenekî helandî ku rûyê*

*wan diperitîne alîkarîya wan bê kirin. (Ew av çi vexwarineke) xedar e û çi spartineke xerab e!"*

Ayetekî din:

ثُمَّ إِنَّكُمْ أَيُّهَا الضَّالُّونَ الْمُكَذِّبُونَ ﴿١٥﴾ لَآكِلُونَ مِن شَجَرٍ مِّن زَقُّومٍ ﴿٢٥﴾ فَمَالِؤُونَ مِنْهَا الْبُطُونَ ﴿٣٥﴾ فَشَارِبُونَ عَلَيْهِ مِنَ الْحَمِيمِ ﴿٤٥﴾ فَشَارِبُونَ شُرْبَ الْهِيمِ ﴿٥٥﴾ هَذَا نُزُلُهُمْ يَوْمَ الدِّينِ ﴿٦٥﴾

*"Paşê hûn hey gelî (kesên) rêşaş û derewîn. Bi rastî hûnê ji darekê, ji dara zeqûmê bixwîn. Hûnê zikê xwe bi wê têr bikin. Hunê di ser wê de jî, ji ava kelandî vexwin. Deveyên tî (bune) çawa dajon ser avê, hûnê jî wisan (ji wê avê) vexwin. Ew zîyafeta ku roja hesab û kitêbê (qîyametê) ji wan re tê teqdîm kirin ev e."*

Belê birayêmin!

Ha ev cehennem cihekî bi vê qasî tirsehêz e. Ji bo vê tirsê çêtir nasbikin em gûhe xwe bidin Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam*. Dema derket mîracê cennet û cehennem jî bi çavên xwe temaşe kiribû. Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* wiha ferman dike:

*"Heke dilopek ji wê zeqûmê ku xwarina ehlê*

*cehennemê ye li ser dinyayê bibare, xwarina temamê ehlê dinyayê dê bi wê dilopê xera bibuna. Nexwe ew ehlê cehennemê ku xwarin û vexwarina wan ji vê zeqûmê ye dê rewşa wan çawa bibe êdî hûn bi fikirin!"*

*"Miroveki ji ehlê cehennemê ku ezabê wî herî sivik e, pêlavek ji agir lê tê wergirtin û ji germa wê pêlavê mejîyê wî dikele. Kela wî wekî ku beroşa li ser agir dikele, bi kelekî wisan dikele. Êş û elemekî pir giran dikişîne. Di nava ehlê cehennemê de tevlî ku ezabê herî sivik ew dikişîne ew e. Lê ew jî, li cem xwe zen dike ku ji xeynî min tu kes ezabekî wîha nakişîne."*

*"Roja qiyametê mirin weke beranekî belek di nevbêra cennet û cehennemê de tê sekinandin û li ber çavên wan dê bê serjêkirin. Heke kesekî ji şahî û kêfê bimirina ehlê cennetê di wê lêhzê de wê bimirana. Û heke ji qehr û kederan kesekî bimirana wê ehlê cehennemê di wê lehzê de bimirana."*

Vê gavê ez carekî din dixwazim ji te bipirsim:

Tu xwe didî ber vê barê?

Ji bo vekirina devika vê xezîneya bi rûmet û

vekirina deriyên wê war û welatê pir bûha û bê misil. Were em bi hevre wan devik û derîyên cehennemê jî ku weki çal û newalekî bê binîye bigirin û qufîl bikin, înşaallah!

Hemd ji Allah re be ku tu jî dibêjî

*'Belê ez heme!'*

Dengê te newe min jî ez hest dikim, elhamdûlillah…

Ji bo ku deriyên cennetê vekî û pê re jî deriyên cehennemê qufîl biki va ji te re mifteya yekemîn. Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* wîha ferman dike:

*"Heta hûn îman neynin, hûnê nekevin cennetê."*

Eger tu bêji *"Temam, ji xwe min îman anî bû, nexwe cennet li hêvîya min e"* ez jî ji te re dibêjim bisekine, raweste, nelezîne. Ewilî em binêrin ka îman çiye, çi nîne? Aniha em bi hevre ayetekê ji Qur'ana pîroz bixweynin.

Allah *azze we celle* wiha ferman dike:

وَمَا خَلَقْتُ الْجِنَّ وَالْإِنسَ إِلَّا لِيَعْبُدُونِ ﴿٥٦﴾

*"(Ne ji bo tiştekî din) Ji bo ku ji min re îbadetê bikin; min cinn û însanân xuliqandin. "*

Belê birayê min! Dema ku me ev ayet xwend, te ji hest kiribe meqseda xuliqandina me vikîvekirî derket holê.

*“Tu ji bo çi hatî xuliqandin?”*

Ji vê pirsê re bersiva herî xweşik bitenê kelîmeyeke. Ew kelîme jî ev e:

ABDÎTÎ!

Kelîmeya *“Abd”* di zimanê Erebî de û di zimanê Kurdî de kelîmeyekî hemwate ye. Yanê maneya wan yek e. Te navê *“Abdullah”* pir seh kirîye. Ev nav ji wan navên ku ji ALLAH *azze we celle* re gelek şîrîn û xoşewîst e. Yanê tê maneya *“Abdê Allah”*

Abdîtî şeklê herî xweşik e, ku mirov bibe bendeyê Xwedanê xwe. Yanê xwedîyê xwe. Maneya yekî abdîtî yê, yek jî koletî ye. Ez dibêjim koleti lê belê bi vê gotînê bila di serê te de îteatekî bi zordestî cih negire. Çimkî koletî û abdîtî hege ji bo Allah be, ew koletî ji dilûcan û bi canûser tê kirin. Abdîtî ya ji xwedanekî adil û birehim re helbet ji xweditî û serekvanîya gel û komarekî zordest hê çetir û qenctir e.

Adem *aleyhîsselâm* dema ku abdîtîya Heq tealâ qebûl kir azad bibû. Dema ku şeytan li hember Heqqê pozê xwe mezinkir û serî hilda ew jî bu kole. Koletîyekî pepûkî û mirarî. Tu vê ferqê qenc fêmdikî ne wisan?

Divê tu ji bo xweditîya cennetê abdîtîya Heqqê ji xwere çêtîr bibinî. Qet ji bîr neke ku ew xwedan ê ku tûyê bibî talibê abdîtîya wî çavkanîya edaletê ye. Û bizanibe ger tu xwe ji abdîtîya Allahê xalıqê aleman dûr bixî wê ji te re derîyên koletîya taxutan vebe.

Birayêminê ezîz!

Rêya ragihiştina cennetê di îman anînê de, rêya îman anînê di abdîtîyê de, rêya abdîtîyê jî di bendebûna haqqê de derbas dibe. Bingeha vê abdîtîyê da ku cihê xwe qenc bigire çî ye, tu dizanî?

Binêre. Binê vê rêzê bi xêzikekî situr û tarî xêz dikim, tu jî vê rêz ê li ser dilê xwe binexşîne. Bingeha abdîtîya heq ev e:

Qethîyen divê ku xweditî yek û ehed be!

Niha di vê mijarê de em ayetekê din bixweynin. Allah *azze we celle* wîha ferman dike:

ضَرَبَ اللَّهُ مَثَلًا رَّجُلًا فِيهِ شُرَكَاء مُتَشَاكِسُونَ وَرَجُلًا سَلَمًا لِّرَجُلٍ هَلْ يَسْتَوِيَانِ مَثَلًا الْحَمْدُ لِلَّهِ بَلْ أَكْثَرُهُمْ لَا يَعْلَمُونَ ﴿٢٩﴾

*"Allah, ji we re minakekî wîha dide: Zilamekî ku di bin emrê çend heb kesên şirîkên serhişk û bi hev nakin de ye û zilamê ku di bin emrê yek kesî de ye dike mîsal. Ma rewşa van her duyan wekî hev dibe? Hemd bi temamî ji Allah re ye. Lê belê pirên wan nezan in"*

Allah *azze we celle* bi van mîsala me dawetê aqilmendi û hişyarîyê dike. Mesela tu bendeyek bi, yanê em bêjin tu xizmetkarekî û emir û talîmatan jî, ji çend heb kesên ku şirîkên hevdu ne distînî. Ji wan xwedîyên te yek maldar e ew ê din cirnexweş e an yek ji wan kal e ew ê din ciwan e an jî yek ji wan jin e ê din mêr e... Û ji te re wîha tê gotin: *"Ev xwediyên te divê ji te qaîl bin û tu carî gazinan ji te nekin"* Û ji te re dibêjin ku tu van xwediyan ji xwe qaîlbihêlî wê xelatekî pir mezin bidin te. Di muqabilê vê pêşniyariyê/vê teklîfê wê tu aniha dest bi xebat û xizmetê bikî, ne wisan?

Ji xwediyên te yek ji wan dê ji te re bêje *"Xwarina min hazir bike"* Ê din jî di wê lehzê de wê gazî te bike û amadekirina cilûbergê xwe ji te bixwaze. Ew ê din wê bêje *"Rojnama min ma li ku derê?"* Ê din bi awayekî din emir bike, ew ê din û ew ê din...

Binêre her xwediyek ji te daxwaziyên cûdahî û cûrbicûr dikin. Bi rastî tu jî bê meferî ku di gavê de daxwazîya wan xwediyên xwe pêk bînî.

Wê tu bi qêrineki bêjî *"Êdî bes e!"* û biqîjînî, ne wisan?

Di ser û dawîya wî de her çi hebe û ew xwediyên te ji te re çi wead bikin jî, tu dîsa qaîl nabî. Di wê lehzê de tu yê ji vê bendetîyê istîfa bikî û ji bo serbestîya xwe çi lazım be tê jî wê bikî. Çimkî di bin van şert û mercan de tu yê dê nikaribî bendetîyê jî biki! Ger tu bendeyê çend heb xwediyan bi her çiqas li ber xwe bidî jî nikarî yek ji wan jî qaîl bikî.

Vê gavê bi fikire birayê min! Mirovek çawa nikaribe ji çend heb xwediyan re bendetî bike weke vê misale, heke tu ji gelek xwediyan re bibî kole

digel vê yekê ka gelo tu yê bikaribi abdîtîyeke bê kêmasî ji Allah *azze we celle* re bikî?

Birayêminê delal!

Bizanibe abdîtîya mekbûl ne abdîtîyeke ji ser û dawî ve ye, ne abdîtîya bi dev û ziman tenê ye.

Abdîtîya Allah *azze we celle* teslîmîyet û girêdayîyeke bi dilsozî û îteateke bêkêmasî ye. Ew abdîtîya ji dil û cân, bê şek û be isyan li cem Allah *azze we celle* mekbûl e. Ev Allahê ku tu jê re abdîtîyê dikî bi dormedor û bi her awayî xaliq û sahibê te ye. Ew her çi ferman bike, fermana wî li ser her tiştî ye. Li hember fermana wî kes nikare li gorî dilê xwe tevbigere û heyata xwe bidomîne.

Paşê li ser nefsa te tû mafên çêtirdîtina tiştekî namîne. Derheqê mijarekî de, diyarkirina fikr û ramanê de ji biryar/qerar tim ê xwediyên kaînatê ye. Razan û rabûna te û axaftin û bêdengîya te, azebbûn û zewaca te, silh û pevçuna te yê bi digel mirovan re bitenê ev xwedîyen te yê wahîd û ehed e, ew biryar dide. Wê tu jî bi dilekî geş û bi dilekî asân teslîm bibî.

Birayêmin ê hêja. Binêrê Rabbê me çawa ferman dike:

وَمَا كَانَ لِمُؤْمِنٍ وَلَا مُؤْمِنَةٍ إِذَا قَضَى اللَّهُ وَرَسُولُهُ أَمْرًا أَن يَكُونَ لَهُمُ الْخِيَرَةُ مِنْ أَمْرِهِمْ وَمَن يَعْصِ اللَّهَ وَرَسُولَهُ فَقَدْ ضَلَّ ضَلَالًا مُّبِينًا ﴿٦٣﴾

*"Herweha, dema ku Allah û Rasûlê wî hukmê karekî bidin; êdî heqê mêr û jinên mûmîn tûneye ku ew li gorî daxwaza dilê xwe tevbigerin. Kî li hemberî gotina Allah û Rasulê wî serî hilde; bi rastî ew zivirîye xerifîyeke eşkere."*

Tu dibînî ne wisan? Va abdîtî, ev e. Bendetîya xaliqê kaînatê ku însan bi vê bendetî û abdîtîyê şanaz û ezîz e.

Heke tu jî abdîtîyeke wisan teqdimê Allah *azze we celle* neki ne bêje *"ez abdîtîyê ji Allah re dikim, ez abdê wî me û ez Abdullah im."* Xwe bi van gotina nexapîne birayê min.

Dibe ku ji bo vê gotina min a dawî tu lewma li min bikî û xwe hêrs bikî û dilê xwe teng bikî. Weke ku ez dengê te dibihîzim ku tu dibêjî *"Hâşâ! Ez bitenê enceq ji Allah re dibim evd. Ji xeyni Allah azze we celle ji tu kesekî re ne abdîtî û ne ji koletiyê dikim. Xwediyê min yek e, ew jî Allah e"*

Lê belê tu dixwazi li ser vê doza te em hinek bisekinin. Tu dibêjî *“Ez bitenê, enceq ji Allah re dibim evd”*.

Bila bê bira te, dema ku Allah *azze we celle* hemû rohan xuliqand û piştre jî, ji me temaman peyman yanê soz û ehd sitendibû. Allah *azze we celle* di vê mijarê de wîha ferman dike:

وَإِذْ أَخَذَ رَبُّكَ مِن بَنِي آدَمَ مِن ظُهُورِهِمْ ذُرِّيَّتَهُمْ وَأَشْهَدَهُمْ عَلَى أَنفُسِهِمْ أَلَسْتَ بِرَبِّكُمْ قَالُواْ بَلَى شَهِدْنَا أَن تَقُولُواْ يَوْمَ الْقِيَامَةِ إِنَّا كُنَّا عَنْ هَذَا غَافِلِينَ ﴿١٧٢﴾

*“Ji bo ku hûn roja qıyametê nebêjin: ‘Em ji vêya ne hayîdar bûn,’ Rabbê te ji pişta zaroyên Âdem zuriyeta wan girtibû û jî nefsa wan re kiribû şahid. Û (ji wan re gotibû) ‘Ma ez ne Rabbê we me?’ Wan jî gotibûn: ‘Belê’ (tu Rabbê me yî), em ji veya re şahid in.”*

Belê...

Me wê rojê ehd û peyman da. Me ji bo çi soz da? Me li ser vê tiştî soz da ku Rabbê me ew Allah ê Wahîdu’l Qehhar e. Û me van ji got:

*“Ya îlahê min! Tu yî Rabbê min, tu yî xwedîyê*

*min, ez evde te me. Û ez ehd û peymana xwe dubare/tekrar dikim. Yek rayedarekî/hakimekî ku tevli heyata min bibe ew rayedara yekane tu yî. Êdî di qada jiyana min de teqez/muheqqeq wê fermanên te rewacdar bibe. Ez tu fermanî li ser fermanên te nagirim û nasnakim. Ez ê jiyana xwe tenê bitenê li gorî fermanên te sererast bikim...”*

Pişti ku mirovekî vê ehd û peymana zexim anî ser ziman êdî jê re lazime ku li ser vê soza xwe bi şeklekî qewî bisekine û bi mêrxasî sebatê bike. Ji bo ku Allah *azze we celle* weada xwe bi cih bine û mizgîna cennetê bide te. Lê belê ka em mêze bikin li ser vê ehd û peymana xwe em çi qas bi dilsozî mane.

Allah *azze we celle* ji me çi duxwaze lê em çi dikin? Divê ku ev Qur’ana Pîroz, ji wîladetê/ji hatina dinyayê heta mirinê ji bo me bibe binyada jiyana me û malbata me û gelê me û heta temamê munasebetên me yên civakî.

Lê belê em çi dikin? Tevli van ayetên eşkere û fêmbar em ji van fermanên Rabbanî rûyê xwe vedigerînin. Em terka vê Qur’ana Pîroz dikin û temamê şixulê xwe li gorî qanûnên beşerî saz dikin.

Allah *azze we celle* ji mere dibêje *“Xwediyê hûkim û hakimê yekane ez im, ji xeynî min hakim qebûl nekin”*.

Li ser vê fermanên îlahî em dîsa çi dikin? Serê çar-pênc sala carekî ekseriyeta gel wê hilkişin ser sindoqan û wê hilbijartinê, yanê seçimên demokratîk bikin! Çiye ew tiştê ku tên hilbijartin? Ew ê ku diçin ser sindoqên hilbijartinê wan însanên wekî xwe dikin wekilê xwe û ji wan re dibêjin *“De kerem bikin, li ser navê me helal û heraman deynin, qanun derêxin û hûkim bîna bikin!”*

Rayeya/yetkîya qanûnçêkerîyê û derxistina hûkim tenê bitenê her ku aîdê Allah *azze we celle* ye ew vê rayedarîye ji Allah *azze we celle* distînin û didin hinek însanên wekî xwe. Me ji wan re got:

*“Ji kerema xwe, kerem bikin hûn li ser me bibin rêveber, bibin îdarecîyên me. Em ji van qanûnên we pir razî ne. Bêguman em ê îteatê li we bikin”*.

Bi vê pêşniyariyê em bûn hêsirê zordestân û mehkûmê bindestîyê û belengazîyê. Bi rastî bi vê awayê gelekî ji me bi tevli Allah, abdîtîyê li hinek xwediyên din re jî dikin.

Lâ hawle we lâ quwwete îlla bîllah...

Ka em çawa di ehd û peymana xwe de sekinîn? Me bi sedan, heta bi hezaran xwedan û xwediyan xistîye mêjîyê xwe û dilê xwe û jiyana xwe. Niha em ê bi çi rûyî bêjin em hê jî bi dilsozî girêdayîyê ehd û peymana xwe ne.

Wê kî ji vê doza me bawêr bike?

Birayêminê eziz!

Abdîtîya herî meqbûl enceq abdîtîyekî bê şerîkî û li ser aqîda tewhîdê ye.

Ger tu bixwazi ji xeynî Allah *azze we celle* hin xwediyên din jî ji xwe re çêki û wan jî razî bikî bizanibe ku Allah *azze we celle* teqez ji te razî nabe. Digel vê yekê ew xwediyên ku te ji xwere çêkirine û hin ji wan jî doza xwedanîyê dikin bi tu awayî ji te qaîl nabin ku tu bi tevlî wan Allah jî razî bikî. Tu vê yekê qenc bizanibî. Allah *azze we celle* vê amelê te di Qur'ana Pîroz de bi navê şirk binav dike. Ew kesên ku wisan tevdigerin ew jî bi navê muşrîk tenê binav kirin.

Niha belki tu bêjî *"Elhamdulillah, ez pênc ferz*

*nimêja xwe dikim, rojîya meha remezanê yek rojek jî li xwe naborînim. Ne ê min û ne jî ê zarokê min, di qirikame de gepa heram derbas nebûye. Sala borî hemd ji xweda re min hecca xwe jî kir. Ez muslîm im. Binavkirina min bi navê muşrîk qet tu carî ne mimkûn e!”*.

Madem te wisan got ez jî dibêjim were em bi hev re herin dema berîya vêga çarde qerna.

Em li wan muşrîkên ereban ku Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* ji wan re bi risaleta pêxemberîyê hatibû şandin, nêrineke bihûrnêrin binêrin.

Birakê hêja!

Tu jî dizanî ku Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* çarde qernên berî vêga di nav qewmekî muşrîk de bi daweta aqîda tewhîdê derket holê. Ew qewm, qewmekî muşrîk bû. Allah *azze we celle* ji îmana wan teqez ne razî bû. Bala xwe bide vê gotina min da ku ev mijar qenc fêm bibe. Allah *azze we celle* ji *“îmana wan”* ne razî bû. Yanê ji vê tê fêmkirin ku ewana jî *“îman dikirin”*. Lê belê Allah *azze we celle* ji îmana wan ê bi vê awayê qet ne razî bû. Em tev

dizanin ku Qur’ana Kerîm tim behsa wan û kufra wan û dilmerezîya wan dike. Belkî biwêja *“îmana wan”* ji te re tiştekî pir xerib xuya dibe.

Dema navê muşrîk an jî navê kafir tê ser ziman, bitenê ew kesên ku bejna xwe di hizûra saneman de ditewînin û ji bo wan diçin sicûde û tazîmê li putan dikin tên bîra te ne wisan?

Ha li ser vê xalê raweste. Di vê mijarê de em ji kêmagahiyê dişehitin. Lewre kesên ku Qur’an bi navên *“muşrîk û kafir”* behsa wan dike, hebûna Allah *azze we celle* inkar nedikirin. Bilakîs bi girêdayîyeke salihane girêdayiyê Allah *azze we celle* bûn. Binêre Qur’ana pîroz vê mijarê çawa tîne ser ziman:

قُلْ مَن يَرْزُقُكُم مِّنَ السَّمَاء وَالأَرْضِ أَمَّن يَمْلِكُ السَّمْعَ والأَبْصَارَ وَمَن يُخْرِجُ
الْحَيَّ مِنَ الْمَيِّتِ وَيُخْرِجُ الْمَيَّتَ مِنَ الْحَيِّ وَمَن يُدَبِّرُ الأَمْرَ فَسَيَقُولُونَ اللّهُ
فَقُلْ أَفَلاَ تَتَّقُونَ ﴿١٣﴾

*“Ji wan re bibêje: ‘ Ji erd û esmanan kî riziq dide we? Yan jî malikê çav û guhan kî ye? Ê ji mirîyan zindî û ji zindîyan jî mirîyan derdixe kî ye? Kî fermana xwe dimeşîne (û kaînatê îdare*

*dike)?' Wê bibêjin: 'Allah' 'Wê gavê ma çima hûn xwe naparêzin?"*

Birayêmin!

Niha van pirsan ji xwe bike. Bêguman wê tu jî ji temamê van pirsan re cewaba *"Allah!"* bidî, ne wisan? Heta tu dixwazî van pirsan ji wî kesê bike ku dibêje *"ez muslîm im"* lê belê bê nimêj û bê rojî û bê destnimêj e, ew ê jî dê eynî bersivê bide: *"Allah!"*

Birayêminê xoşewîst!

Bizanibi ku bawerîya bi Allah *azze we celle* di temamê komal û civakên muşrîkan de bawerîyeke hevpar e. Yanê bizimanekî fêmdarî em bibêjin, temamên muşrîkên li ser rûyê erdê bi zimanên xwe dibêjin *"Bêguman bawerîya me bi Allah heye"*. Dizanin xaliqê erd û asîmana Allah e *azze we celle*. Binêre qewmek heye ku di Qur'anê de behsa wan tê kirin. Di sûreya Ya- sîn de dibore. Allah *azze we celle* ji wan re gelek pêxemberan şandibû enceq vê qewmê ew pêxemberên *aleyhimûsselam* ku ji wan re hatibûn şandin berê xwe ji wan vegerandin û wan derewandin.

Allah *azze we celle*, dawîyê de vê qewmê helak kir. Ha ev qewmê ku li hemberê Nebiyan *aleyhîmûsselam* radibûn jî wisan digotin:

*“Ew Allah ku Rehman e tu hinarîyeki /tu tiştekî ne şandiye”.*

Yanê tevlî îman anîna Allah *azze we celle* ji sifetê wî yê Rehman jî hayîdarbûn. Lewre ji gotinên wan tê fêmkirin ku Allah *azze we celle* bi sifetê *“Rehman”* nasdikirin.

Herwîha ezê ji te bipirsim?

Ev mirov di vegotinên xwe de dibêjin bawerîya me bi Allah heye û pêre jî neyartîyekî dijwar li Nebiyan *aleyhimûsselam* dikirin, çima? Allah *azze we celle* ji çi sedemê ji îmana wan ê ku dianîn ser ziman ne razî bû? Belki wê tu bibêji *“Belê wan digot em bi Allah bawer in lê bi vê bawerîyê re ne bi nimêj û ne bi hec û ne ji bi rojîyê û bi wan îbadetên din abdîtîyê ji Allah azze we celle re dikirin. Lê belê ez nimêj dikim, rojî digirim. Ez çûme heccê jî. Çûna min a heccê ya dawîyê cara sêyemîn bû. Zekâta xwe jî didim. Ez van jî ji xwe re têr nabînim. Çûkas feqîr û belengaz li dor û derê min hebin ez*

*dest davêjim wan û çi hewcetîyê wana çêdîbe ez pêk tînim. Ev tiştên ha, ferqên di navbêra min û wan muşrîkên berê de ne.”*

Lê bizanibe tu ji kêm agahîyên dişehitî, yanê tu xelet î, birayêmin!

Dixwazî ez ji te re hinek behsa heyata gelên muşrîk bikim. Ez bawer im wê bi vê awayê ev mijar wê xweşiktir bê bira te.

Birayêminê hêja!

Di temamên kom û civakên muşrîkan de çawa ku min ji te re qiset kir bawerîya Allah *azze we celle* her heye. Yanê muşrîkên dinyayê ji berê de îman bi Allah anîne. Ew muşrîk baş dizanin ku xaliq ew e, hebûn pê ye, mirin jî jê ye. Gelên muşrîk pir ji wan xwe bi pêxemberekî ve gire didin. Yanê baweriyê bi wan Pêxemberê ku Allah ji wan re şandîye tînin. Herweha muşrîkên Mekkêyê di gotin *“Me îman bi kalê me Îbrahîm anîye”*. Xiristîyan jî dibêjin *“me îman bi Îsa anîye”*. Cihû/Yahûdi jî dibêjin *“me îman bi Musa anîye”*.

Helbet bi pêwîstiya gotinên xwe şerîata ku Pêxemberan *aleyhimûsselam* ji wan re anîbûn di

jiyana xwe de çend hûkman carî dikirin, pêk dianîn.

Şah Velîyullahê Dihlewî *rahîmehullah* alimek ji Hindê ye û di nav alimên îslamê de cihekê wî yên xuyane heye. Di mijara îbadetên muşrîkên Mekkeyê em ê jêgirtinekî jê bikin. Ew wisan dibêje:

*"Muşrîkên ku di dewra cahiliyê de divejiyan qenc diznîbûn ku Allah azze we celle erd û asîman û her tiştên di navbera wan de xuliqandiye. Ji zerreyê heta kûrreyê yek şerîkê wî di îdareya vê kaînatê û di karên nav de qet tûne ye.*

*Bawerîyeke wan yê xweşik jî ev bû ku îmana wan bi qederê hebû. Bi vê bawer bûn ku her tiştên bûyî an jî hêj nebûyî Allah azze we celle ji ezel ve teqdîr kiriye. Bi vê jî bawer bûn ku Allah azze we celle evdên xwe bi tiştên ku wî daxwaz kiriye bi wan tiştan mesûl dike. Hinek tiştan ji bo însan xweş û helal kiriye, hinek tiştan jî heram û qedexe/yasaq kiriye û temamên însana ji amelên wan wê bikişîne hisabê.*

*Wan muşrîkên Mekkeyê di mijara îbadetê de*

*giringîyê/ehemmîyetê didan taharetê jî. Xweşuştin, ger cinûb dibûn kevneşopekî wan yê dihat zanîn bû. Weke qusandina neynûkan û weke sûnnet bunê hin tiştên taybetîyên fitrî di nav wan de dihat pêkanin. Sitendina destnîmêjê him cihûya, him mecûsiya û him jî muşrîkan dizanibûn. Berî ku bê cem Rasûlullah aleyhîssalatûwesselam û bibe muslîm Ebû Zer radiyallahuanh hê di cahilîya xwe de jî nimêj dikir. Ew nimêja ku Yahûdî, Mecusi û digel ereban dikirin bi taybetî wekî sicûdê hin hereketên ta'zimê û hinek dua û zikir bûn.*

*Mirovên cahiliyê zekatê jî dizanibûn. Di vê mijarê de mevan û rêwîyan diezimandin. Alîkarî li qels û belengazan dikirin. Sedeqe didan hêjaran û alîkarê wan kesên ku ditengasiyê de bûn. Wan muşrîkan jî dema fecrê heta dema êvarê bi îbadeta rojîyê jî dizanibun û hin ji wan amel dikirin. Muşrîkên Qureyşê dema cahiliyê de rojîya rojên aşurayê digirtin. Bikurtahî muşrîkên dewra cahiliyê her şeklên îbadetê baş dizanibûn."*

Va tu dibinî birayêminê ezîz!

Tenê bi gotina te yê ku tu dibêjî *"Ez jî muslîm im û îbadetê ji Allah re dikim"* ji bo xelasiya te

têr nake. Eger bilêvanîna bawerîya Allah û bi pêxemberan û bi roja axîretê û kirina hin îbadetan tenê ji bo xelasbunê û navandina bi navê muslîm têr bikirana pêşanî ew muşrîkên Mekkeyê ku Allah azze we celle ji wan re Muhammed *aleyhîssalatûwesselam* bi pêxemberî şandibû, wê ew bixwe ji zillet û ezabê xelas bibûna. Lê belê weke ku berê de jî min ji te re gotibû û weke tu jî baş dizanî Allah *azze we celle* muşrîkên Mekkeyê di gelek ayetên xwe de binave *"kafir"* û *"muşrîk"* binav dike.

Dibe ku tu îtirazê li min bikî û bibêjî:

*"Çimkî ew muşrîkên Mekkeyê bi eşkerehî diçûn pêşberê put û saneman û ji wan putan re bejna xwe ditewandin û wan tazîm dikirin. Her dem ji pûten xwe yê herî mezin (Lat, Menat û Uzza) re îbadet dikirin. Ji ber vê sedemê Allah azze we celle ji wan û ji îmana wan qet razî nebû.*

*Qey em û wan weke hev dibin? Elhamdulîllah, tu putên me yê ku em li pêşberê wan bejna xwe ditewînin û wan tazîm dikin tûne ye"!*

Wê gavê ezê ji te vê pirsê bikim:

*"Madem mijar bitenê rabun û tewandina li hemberê putan e nexwe çima Allah azze we celle ji îmana wan xiristîyanan û Cihûyan; ew ên ku Îsa aleyhisselam û Musa aleyhisselam ji xwe re pêxember zanibûn û teqez ji putan berê xwe vegerandibun ne razî bu!*

*Allah azze we celle çima wan xiristîyan û cihûyan ji bi navê kafir û muşrîk binav kir gelo?"*

Ya rastî bersiv pir eşkereye birayê min. Belê, van mirovan bawerî bi Allah anîbûn û Rabbîtîya wî qebûl kiribun. Di jiyana wana de gelekî şeklên îbadetê hebun. Lê belê ewan kesan ji Allah re *"ŞİRK"* diajotin. Yanê wekî ku min berê de ji te re gotibu wana ji yek xwedîyê re bendetî nedikirin. Belê, wana Allah *azze we celle* ji xwe re Xwedî dizanibun lê belê dixwestin ji xeynî Allah *azze we celle* hin xwediyên din jî razî bikin. Allah *azze we celle* ji vê hal û îmana wan qet razî ne bu.

Her ku em li ser vê mijarê ne ez dixwazim ji te re behsa şirkên muşrîkên Mekkeyê û xıristîyan û cihûyên Medineyê bikim. Muşrîkên Mekke yê Mirovên wisan bûn ku di jiyana wan de dûr buna esl û enwaên şirkê ji wana re armanc bû.

Dema ku wana Ka'beyê/Beytullahê tewaf dikirin lewma wiha digotin *"Lebbeyk Allahumme! Lâ şerike leke..."* Yanê *"Biferme Allahê min, teqez tu şerîkê te tûneye... Duayên xwe wiha didomandin: 'Tenê şerikekî te heye ku xwediyê wî jî û xwediyê rayedariyên wî jî tu yî...' "*

Bi vê awayê wan ji daxwazî ji Allah *azze we celle* dikirin ku bibin evdên wî yên muxlîs û xweşewîst. Ji bo vê hin kesên salih ku di demên borî de vejiyane heykelên wana çê dikirin û ji van heykelan re tazîm dikirin. Pêşerojekî kurt de van putan ji bo duayên xwe kirin wesîle û ji Allah *azze we celle* daxwazîya wan ev bû ku ji bona xatirê putan duayê wan qebul bibin. Ev şirka wan di Qur'anê de wîsa derbas dibe:

...مَا نَعْبُدُهُمْ إِلَّا لِيُقَرِّبُونَا إِلَى اللَّهِ زُلْفَى...

*"...Ji bo ku me nêzî Allah bikin em ji wan re îbadetê dikin..."*

Çawa ku te dît, armanca wan muşrîkan ev bû ku zêdetir nêzîkî Allah *azze we celle* bibin. Lê belê ew amelê ku dibe wesîleya nêzik bûna Allah *azze we celle* ne tiştekî wîha bû. Wana ji vê nêzikbûnê

ne bi awayê ku Allah *azze we celle* hînî wan kiribû pêk dianin. Wesîle û wasiteyên cûrbicûr dixistin navbêra xwe û Allah *azze we celle*. Herweha di nav gûnehên şirkê de winda dibûn û bêguman navê *"muşrîk"* heq dikirin.

Em werin mijara fille û cihûyên Medineyê.

Di heyata wan de rewşeke tazîma saneman an îbadetên putan qet ne hatibû dîtin. Enceq, muşrîkên Mekkeyê çawan ji wan kesên mirî re tazîm û îbadetê dikirin ew xiristîyan û cihûyên Medineyê jî ji zindîyan re îbadetê dikirin. Wateya/maneya îbadeta ji zindîyan re ev bû ku wan fîlle û cihûyan ji mirovên olnas re yanê ji keşiş û hêrisên (haham) xwe û bi cûdayî ji rayedarên xwe re îbadetê dikirin.

Niha ez ji te dipirsim birayê min!

Îbadeta ewan ehlê kitêb çawa bû?

Qey wan filleyan û cihûyan ji keşîş û hêrisên xwe re an ji zanyar û olnasên xwe re nimêj dikirin yan diçûn sicûdê yan jî ji bo wan qurban serjê dikirin?

Were birayemîn, were.

Em vê pirsê ji yekî wisan bipirsin ku di bersivdanê de yê herî rayedar ew e, tu çi dibêji? Em biçin cem Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* Di vê mijarê de yê herî ewledar ew e. Ew Nebi yê Rahmeten lil alemîn e. Ew ê ji me re tiştên zehfî xweşik bibêje, ez bi vê ji dilucân bawer im.

Ger dixwazî em pêşî ayetekê bînin bîra xwe. Ji wê Qur'ana Pîroz ku Allah *azze we celle* ji bo me nazil kiriye û ji me re kiriye çavkaniya şîfayê. Allah *azze we celle* wîha ferman dike:

اتَّخَذُواْ أَحْبَارَهُمْ وَرُهْبَانَهُمْ أَرْبَابًا مِّن دُونِ اللّهِ وَالْمَسِيحَ ابْنَ مَرْيَمَ وَمَا أُمِرُواْ إِلاَّ لِيَعْبُدُواْ إِلَهًا وَاحِدًا لاَّ إِلَهَ إِلاَّ هُوَ سُبْحَانَهُ عَمَّا يُشْرِكُونَ ﴿١٣﴾

*"Wan (cihu û fîlehan) ji xeynî Allah hahamê xwe û keşîşên xwe û (Îsa) Mesihê kurê Meryemê ji xwe re kirin Rab. Lê li wan hatibû emirkirin ku ji yek îlahî bitenê re îbadet bikin. Ji wî (ji Allah) pê ve qet tu îlah tunin. Ew ji tiştên ku muşrîk pê şirîkatîyê dikin munezzeh e/berî ye."*

Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* rojekî vê ayetê dixweyne. Di wê lêhzê de Adiyyê kurê Xatem ê Tayî, ku ji pêşîyên Ereban yekî xuyaye û navdar

derket hizura wî. Wê demê êw hê fille/xiristîyan bû û di situyê wî de xaçêke ji zîvê hebû. Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* dema ku xwendina vê ayetê qedand bi dengekî îtirazî ket mijarê û wîha got: *"Me tu caran ji keşîşên xwe re îbadet nekiriye û me wana qethîyen bi Rabbitî qebûl nekiriye..."*

Gûh bide bersiva Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* da ku dil û zihnê te jî zelâl bibe!

*"Tiştên ku Allah azze we celle heram kiribû keşîş û olnasên we wana helal dikirin. Tiştên ku Allah azze we celle helal kiribû ew keşîş û olnasên we wana jî li we heram dikirin. Digel vê yekê we jî îteata wan kir. Îbadet kirina we yê li olnasan (keşiş û keşeyanên xwe) ha bi vê awayê çêbûye."*

Sûbhanallah!

Tu dibînî ne wisan birayê min?

Ji xeynî êw ên ku Allah *azze we celle* destûr dane pê ve îteata tu kes û koma ne caîz e. Lewre di vê rewşê de navê wê îteat û girêdayinê dibe îbadet...

Ji vê hedîsan pêxember *aleyhîssalatûwesselam* em vê jî fêmdikin ku razîbûna Allah *azze we celle*

di mijarekî de tûne be, di wê mijarê de îteat û peyrêwîtîya însanan koletîyeke dijwar e. Mirovekî di abdîtîya Allah *azze we celle* de dozdar be û pêre jî rabe koletîyê ji însanan re bike!

Ev sextekarî ye lê belê kesên ku wisan tevdigere bitenê xwe dixapine.

Belê li ku derê ma îslam? Ka me digot îslam ew e ku însan bitenê ji Rabbê erd û esmanan re abdîtîyê bike. Bitenê girêdayîyê fermanên wî û îteatkarîya emir û nehîyên wî bibe?

Tu narêni ew cihû û fîlleyên ku xwe ji Allah re herî evdên xweşewîst binav dikin lê belê Allah *azze we celle* wana binavê *“kafir”* û *“muşrîk”* binav dike. Lewre weke ku me gotibû ewana tevli fermana Allah *azze we celle* rabun îteatê li keşîş û hêrisên xwe û bi cudahî îteatê li rayedarên xwe kirin. Ji ber van sedeman her du kom jî man di dalaletekî giran û tarî de.

Niha em hinek bi fikirin hevalê hêja. Îbadetên me ka gelo ji kî re ye?

Belê em îbadetên xwe yê kesane, weke nimêj û zekat û hecc û rojî ji Allah re dikin û em jê re

abdîtîye dikin. Yan di pêwendiya mijarên jiyana me yê cîvakî (yê sosyal) de em ji kî re abdîtîye dikin? Di van mijaran de em situye xwe ji kîjan kes û koman re ditewînin?

Allah *azze we celle* ji me re kitêbeke pîroz şandiye û vê kitêbê ji bo me kiriye qanuna bingehî (anayasa). Daxwaza wî ji me ev e ku, em di her aliyê jiyana xwe de teslîm û tabiê ve kitêbê bibin. Hêj di demeke pir nêz de ev gelê me ray/deng dan wan kesan ji bo ku kitêbeke nû, yanê qanuna bingehî çêkin. Me ji wan kesên rayedar re got *“Heydê ji kerema xwe ji me re puten modern saz bikin!”*

Ew ji li vê banga me bêhis û sersar neman!

Ew rayeya ku me da wan, piştre rabûn çi kirin?

Rabûn çûne parlamentoyê û serbestî dane amelên ku Allah *azze we celle* heram kiriye. Dîsa bi wê rayeya ku gelê me dabû wan piştre çûn emr û helalên Allah *azze we celle* qedexe/yasaq kirin.

Bizanibe ku di yek mijarekî bê razîbûna Allah *azze we celle* îteat kirina beşera, weke ku mirov li wî kesê an jî komê re îbadetê bike, weke hev e. Tu bi dev û zimanê xwe çi qas dozdarîya muslîmtîyê

bikî bike û çi qas nimêj bikî bike û çend caran hêrî heccê jî, ger tu îteata wan kesên ku bi vê awayê qanuna çêdîkin re bikî û tu tabiê wan bibî bêguman tu ji Allah *azze we celle* re şirk dajoy/şerîk çêdikî û bi van amelên xwe êdî navê *"muşrîk"* ji bo te jî rewacdar e! Lewre Allah *azze we celle* wiha ferman dike:

... وَإِنْ أَطَعْتُمُوهُمْ إِنَّكُمْ لَمُشْرِكُونَ ﴿١٢١﴾

*"Eger hûn bidin pey wan û tabiê wan bibin bêguman hûnê jî bibin ji muşrîkan."*

Birayêminê hêja!

Allah *azze we celle* bi merhameta xwe bi me re bike. Rabbê me em ji heq û hîdayetê dûr negire. Li vê derê ez dixwazim ayetekê ji Qur'ana pîroz ku Allah *azze we celle* vê Qur'anê ji bo ku ji me re bibe dustûra jiyana me şandiye, teqdîm bikim. Rabbê me wiha ferman dike:

لاَ إِكْرَاهَ فِي الدِّينِ قَد تَّبَيَّنَ الرُّشْدُ مِنَ الْغَيِّ فَمَنْ يَكْفُرْ بِالطَّاغُوتِ وَيُؤْمِن بِاللّهِ فَقَدِ اسْتَمْسَكَ بِالْعُرْوَةِ الْوُثْقَىَ لاَ انفِصَامَ لَهَا وَاللّهُ سَمِيعٌ عَلِيمٌ ﴿٢٥٦﴾

*"Di (têxistina) dîn de kotekî/zordarî tune! Lewre îman, ji rêşaşiyê hatîye veqetandin. Kî taxut înkar bike û bi Allah îman bîne, muheqqeq wî*

*xwe bi qulpa herî zexîm ve girtîye ku qetandin jê re tune. Allah sem'î û alîm e."*

*"Kî taxut înkar bike."*

Ez dibejim ku di vê ayetê de kelîmeya *"taxut"* bala te/dîqata te kişandiye.

Taxut çî ye?

Taxut geh şeytan e, geh nefs e, carinan rêxistin (orgut) û sazî (kurum) ne. Caran jî hin tişten cûda ne.

Ev tiştên ku me hejmartin çawa dibin taxut?

Ger emr û nehyê Allah *azze we celle* û hûkmê Qur'ane betal bikin, şûnde hûkm û qanûnên ji çavkaniya aqil û hewayên xwe derêxin holê û pêre jî hemû kes û koman gazî vana bikin, ji bo vê yekê jî zordestîyê li însana bikin, ha ewana bê şek û bêguman taxut in, kafir in û zalim in.

Divê tu di temamê jiyana xwe de ji van taxutan tiştekî nehêli û wana ji mêjîyê xwe û ji dilê xwe derxînî û bavêjî. Da ji bo tu xwe bi wê qulpê ve bizeliqînî ku ew qulpekî herî zexim e û qetandin jê re tune.

Înkar kirina taxut, ji bo zexim girtina vê qulpê şertê ewwil e/şertê yekemîn e. Piştî vê zelalîye êdî îman bi Allah bîne. Ha ew ayeta ku min got bi aweyekî xweşik eşkere kirina kelîmeya tewhîdê ye ku em dibejin *"La îlahe îllallah"*.

Dema ku tu bêjî *"La îlahe"* tê maneya ku tu red dikî.

Bi gotina *"îllallah"* jî, yanê tu qebûl dikî.

*"La"* tê ser maneya Na...

Ji xeynî Allah her çî tişt, kes û komên ku dozdarîya xwedanîyê, çêkirina qanunên ji xeynî hûkmê Allah dikin; bi yek derbekî awaz û qêrinekî ji dil bide û bêje Na!

Û pêre pêre biqîrîne û bêje *"Îllallah!"*.

Yanê ji xweditî û xwedanî û ji Rabbîtîya Allahê yekane re bibêje Erê...

Pêşî red bike û paşê qebul bike!

Pêşi înkâr, paşê îman!

Berê îsyan piştre îteat!

Yanê "La îlahe îllallah!"

Tu bixwazî em niha berê xwe bidin welatê xwe. Ev welatê ku em jî tê de heyata xwe didomînin gelo di vê welatê me de jî taxut hene?

Kîjan amelên ku bên kirin wê me têxe gûnehên şirkê? Weke ku tê zanîn bexşbûn/efûkirin ji wê re tune. Di dewra Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* de navên put û sanemên wan muşrîkan *"Lat, Menat, Uzza"* bûn.

Îro ev put û sanem bi çi şeklê û bi çi navê li ser dilên însanan cihekî zexim girtî ye?

Ger tu bala xwe bidi gotinên min ez behsa taxut bi awayekî giştî dikim. Niha jî ez dixwazim bi taybetî behsa taxutên vê gelê, vê civakê bikim. Lewre usûla Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* ev bu:

Teblîx û danezanîna bi eşkerehî.

Her wiha daxwaza Allah *azze we celle* jî ev bû. Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* jî ji ber vê yekê navên putên wana bi eşkerehî dianî ser ziman.

Ji wan kesên ku şirkên xwe bi eşkerehî nîşan didan re digot:

*"Hê gelî kafiran!"*

Heta gazî kirina bi vê awayê bi emrê “Bibêje!” ji Allah *azze we celle* ve bibû ferz.

Nexwe em ê jî taxut û putên vê dewrê eşkere bikin da ku ev teblîxa me bigêje armanca xwe, ew armanca ku Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* hînî me kiriye.

Belê wekî ku tu jî dizanî li welatê me dineke belavbûyî bi navê demokrasîyê heye.

Bingeha vê dînê li ser fêhm û ramana pirhêjmariyê û wekhevîya bê sînor e. Bingeha pirhêjmarîtîyê jî li ser fikr û hilbijartina gel e, ne li ser heqqê ye!

Her wîha ez ji serê vê pirtûka xwe ve tînim ser ziman ku mafa *“Hakimîyet”* ê tenê bitenê yê Allah e. *azze we celle* Lewre ev raye û maf, bi wan hilbijartinên serê çar pênc sal carek tên kirin ji Allah *azze we celle* distînin û bi îradeya xwe teslîmê parlementeran dikin.

Di vê dinê demokrasîyê de zina û rîba û xumar û bêrêwîştî û xwarina malên sêwîya helal û serbest in.

Ev amelên min niha hejmartin, Allah *azze we celle* di Qur'ana pîroz de teqez heram kiriye.

Lê di dînê demokrasîyê de rewş çawa ye?

Di vê dînê pûç û xêrab de ne ev amelên hanê tenê helal û serbest in. Pêre jî ji bo kesên ku van amelên îfsadê zehftir û birehetî bikaribin bikin ji partamentoyê bigire heta sazîyên herî biçûk alikarîyê dikin. Bi mêr û jinên xwe xulamtî û qerwaşîyê dikin. Wê tu bibêjî ev çawa çêdibe?

Febriqên mey/şerab û meyxaneyên li hawîrdorê welat ku serê sê gava yek rastî te dibe bitemamî bi destûr û piştgirîya vê dewletê dibin. Kerxanêyên di nava welat de bitemamî di ewlehîya dewletê de ne. Ew hêlînên fuhûşê wekî sazîyên dewletê dixebitin. Qey fuhûşa îro bitenê di wan kerxaneyan de çêdîbin?

Na, na...

Bila kes xwe nexapîne.

Deverên ku jin û mêrên nemahrem li cem hev û tevlîhevdû dixebitin, ev xetere/ev taloke

herudaîm ji wan kesan re derîyên heramîyê heta dawîyê vekirî dihêle.

Mijara xumarê jî û ê rîbayê jî wisan e.

Minakek pir balkêş jî mijara rîbayê ye. Rîba, bûye bingeha sîstema/pergala ekonomîya dewletê. Ma bitenê ekonomîya dewletê tenê?

Dewlemendî û pere li ser vê bingehê di nava mirovan de digere. Êw ên ku dewlemend in hêrî xurttir dibin û yên ku feqîr in ew jî herî qelstîr dibin. Sedema vê jî ev sîstema rîbayê ye. Ji ber ku rîba di nava gel de jî bê hed û hisab belav bûye. Hal ev e ku Allah *azze we celle* di Qur’ana pîroz de wîha ferman dike:

الَّذِينَ يَأْكُلُونَ الرِّبَا لاَ يَقُومُونَ إِلاَّ كَمَا يَقُومُ الَّذِي يَتَخَبَّطُهُ الشَّيْطَانُ مِنَ الْمَسِّ...

*“Ew ên ku selefê/rîbayê dixwin, wek mîna wan kesên ku şeytan li wan xistiye (ji gorê) radibin.”*

Ez dikarim weke van mînakên hanê ji te re hêjî behsa wan amelên ku Allah *azze we celle* heram kiriye lê mixabin di vê fitneya demokrasîyê de helal û serbest in bikim. Bi vê aqîda demokrasî û laîktî

ew dewleta li dijî emr û nehyên Allah *azze we celle* serî rakiribe ew jî li gorî terifa Qur'anê taxut e. Yanê dinê Allah *azze we celle* betal kiriye, şûnde qanunên xwe yên kurmî û hefnikî bicih kiriye.

Tevgera van kesên ku dozdariya demokrasîyê û laîktîye dikin weke tevgera koran e.

Çawa ku kesên kor têxin xengerekî ku fîl tê de heye û ji wan koran re bêjin her yek ji we terîfa wî tiştê ku li hindur heye bikin.

Her korekî wê bi awayekî terîf bike. Ew korê ku destê wî rastî lingê fîl hatibe wê wiha bêje: *"Ew tiştê li hindur qolonekî/dîrekekî pir mezin e!"*

Ew korê ku destê wî rastî xortoma fîl hatibe ew ê jî wiha bêje: *"Hey loo ... Li hindur çi xortomekî sitûr heye!"*

Ew korê di dawî de bikeve hindur û destê wî jî rastî gûhên wê fîlê bê, wê terîfa fîl wisan bike: *"Hevalno! Min li hindur baweşek wisan fireh û mezin dîtiye ku nayê gotin!"*

Êdî ev demokrasî û laîktî jî îro di nava welatê me de fitneya herî mezin û belavbûyi û kûr û dij-

war e. Ew kesên ku xwe davêjin bextê demokrasîyê mîsala wan kesan weke mîsala fîl û koran e.

Mixabin ev bela û fitneya demokrasîyê û laîktîyê bi destê dewletê di nava gel de belav dibe û kûr dibe. Her kesek û komek wek terîfa kora ku fîl terîf dikirin, ew jî bi wê ûsûlê demokrasîyê terîf dikin.

Bi rastî terîf û danasîna demokrasîyê heta niha hê kesekî bêkêmasî nekirîye. Ji ber ku hinek kes, doza heq û mafên însanan ê ku Allah *azze we celle* bi xuliqandina wan re daye wan dikin em lê dinerin ku bitenê ji bo vê mijarê xelk terka aqîda tewhîdê dikin.

Bi xapên dewletê dixapin û di nava kemînên wî de bi ber helakê vê dibezin. Ev dewlet bû ku va sed sal zêdetir e, bi her awayê zordestîyê xwest ku xelkê xwe geh bi daran, geh bi perwerdehîyê û geh bi bombeyan têxe rêzê. Niha ev dewleta taxut jî dizane ku tenê bi dar û bombeyan wê ne gêje armanca xwe, dest bi hîle û pîleyên din kirin. Fikr û ramanên kûfrê li ser me barandin. Ew taxutê reş û tarî çû, taxutekî gewrane derkete holê!

Ji me re got “heq û maf, xweserî û azadî!” pêre me ji xwe re kir evd û kole.

Hûkmê *“La Îlahe Îllallah Muhammed’un Rasûlullah”* betal kir.

Hin putên mirî û zindî ji te re bi xwedatî da qebul kirin. ji ber ku ev dewlet li ser vê aqîdê hatiye sazkirin û vê aqîdeyê bi temamê hêzên xwe û sazûmaniyen xwe belav dike weke ku min berî vega jî ji te re got ev dewlet taxut e.

Kesên bi zanîn, yekser an neyekser piştgirîya vê taxutê bike ew jî neferekî taxutan e.

Her bi çi nîyetê jî be, ev taybetîyên min hejmartin li ser kesekî an komekî an rêxistinekî (orgutekî) an jî dewleteki hebe ew jî taxut e. Êw ên ku îteat û giredayîya xwe ji wan re bi awayên cûrbicûr nîşan didin Allah *azze we celle* wan kesan teqez/qethîyen efû nake. Çimkî ew mirov bi vê tevgerên xwe ketine şirkê. Şirk jî gûnehekî efukirina wê tune û cezayê wê jî doja/cehnemeya bêdawîye –neûzubillah-. Her wiha ger bi yekcar tu van taxuta red bikî, înkar bikî!

Yanê divê pêşî û lehzeyek ji lehzeyeki zûtir xwe

ji şirkê dûr bikî, şirkê terk bikî. Lazime paqijî û zelâlîya xwe ji gunehên şirkê bi vê karê dest pê bikî. Pêşî acizî û nefreta ji batıl re û piştre muhabbet û dilsozîyekî pir qewî ji Rabbê aleman re...

Di encamê de ev hate fêmkirin ku çawa hinek însan gotina *“La îlahe”* ji bîr kirin û bitenê *“Îllallah”* ji xwe re kirin wird û tesbîhat, bi vê awayê helak bûn.

Weke vê hinek însan jî bi şev û roj zikra *“La îlahe”* dibêjin lê ji ber ku *“Îllallah”* ji bîr dikin bila ew jî li hêviya helakê bimînin.

Lewre aqîda tewhîdê yekpare ye, nayê perçe kirin.

Erê birayêmin.

Ew kelîmeya hanê kelîmeyeke wisan e.

Fêmkirin û amel kirina wê ya bi dilsozî qedandina temamên kûl û derdên dinyayê ye. Çimkî ev kelîme bê şek û bêguman xwediyê xwe ji qehr û kederên dinyê û ji tirs û ezabên cehennemê ku belayekî herî mezine wê -biiznillah- xelas û azad bike.

Bizanibe ku sekin ji şeytan re tune. Dibe ku di vê lehzê de wesweseyekî têxe dilê te û wisan bêje:

*“Tenê bi kelîmeyekî ji wî cehennemê ku belayekî pir mezin e, wê însan çawa xelas bibe?”*

Ezê bersivê/cewabê bi zarê Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* bidim ku ew herî rast û herî ewleyi yê însana ye. Wiha ferman dike:

*“Allah azze we celle roja qiyametê mirovekî ji ûmmeta min li hafa herkesî dikişîne hisabê. Ji amelên wî yê ku di aleyhê wî de ne not û neh dosye vedibin. Her dosyeyek heta devera ku çavê te dibîne mezin û giran e. Piştre jê tê pirsîn: “jî van dosyeyên tu dibînî tiştekî ku tu ji wan red bikî heye? Muhafizên min ê amelan, melekên katibîn qet neheqi li te kirine?”*

Ew kes wiha bersiv dide: *“Na, ya Rabbê min!”*

Pirsekî din jê tê kirin *“Erê li cem me amelekî te yê meqbûl heye û îro dê li te qet neheqî neyê kirin.”*

Kaxizekê ku li ser wê kelîmeya şehadetê nivîsîye tê derxistin. Allah *azze we celle* jê rê wiha ferman dike: *“De îro mêzêna xwe tu bixwe bike.”*

Ew mirov dibêje: *“Ya Rabbi! Evê ha tenê yek perçeyekê kaxiz e. Lê ez ewan dosyeyên gûnehên xwe jî dibînim. Gelo encam we çawa çêbe?”*

Allah *azze we celle* jê re wisan ferman dike: *“Îro wê li te qet neheqî neyê kirin aleyhîssalatûwesselam”*

Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* wiha pê de çu:

*“Dosyeyên wî têxin şikevîkekî/kefeyekî û ew kaxizê ku li ser “La îlahe îllallah Muhammed’un Rasûlullah” nivîsandî têxin şikevîka din de. Şikevîka ku dosyeyên wî tê de bilind dibe. Lê ew şikevîka ku kaxiza li ser şehadeteyn nivîsî ye girantir dikişîne. Li hember navê Allah azze we celle tiştekî din giran nakişîne.”*

Gûnehên te tevde li aliyekî û gotina te yê tevlî înkar û redkirina taxutan li alîyê din bê danîn bêguman wê kelîmeya şehadetê herî girantir bikişîne û bi lutf û kerema Allah *azze we celle* wê tu daxilê cennetê bibî.

Lê belê ez dixwazim di vê xalê de ayetekî herî giring/muhim bînim bîra te. Em bi hev re li ser vê ayetê bistxeberek/kêlîyek tefekkûr bikin.

Rabbê me di sûreya Nisa ayeta 116'de wiha ferman dike:

إِنَّ اللّهَ لاَ يَغْفِرُ أَن يُشْرَكَ بِهِ وَيَغْفِرُ مَا دُونَ ذَلِكَ لِمَن يَشَاء وَمَن يُشْرِكْ بِاللّهِ فَقَدْ ضَلَّ ضَلاَلاً بَعِيدًا ﴿٦١١﴾

*"Allah, tu carî şirîkatîya ku jê re tê kirin efû nake. Lê belê ji vê gunehê (ji şirkê) pê ve kîjanê bixwaze efû dike. Ew kesê ku ji Allah re şirîkan çêbike, bi rastî ew ketîye dalaleteke mezin."*

Livê derê ev xal bi teybetî bala me dikişîne. Ku Allah *azze we celle* bi teqdîr û daxwazîya xwe hemû gunehan dikare bibexşine/efû bike, bitenê guneha herî mezin û giran, yanê guneha şirkê qet û qet efû nake.

Erê birayêmin.

Çawa ku tu jî seh dikî Rabbê me piştî îmanê, gotina *"La îlahe îllallah"* ê bi dilsozî û pêkanîna wacîbatên wî, gunehên mûmînan di lehzê de dibexşine/efû dike. Lê ew kesê ku Jê re şirîkan çêbikin her çi amelên bi sûd/bi feyde û bikêrhatî bike jî, xelasiya wî ji xezeb û ezaba Allah *azze we celle* tune. Allah azze we celle çawa di bexşandinê de bi merhamet e, eger jê re şirîk bên çêkirin li

hemberî vê asêbûnê jî bi edaleta xwe re şedîdu'l îqab e.

Tu min fêm dikî ne wisan?

Piştî ku te îman anî û pê de; te her çi guneh kiribin Allah *azze we celle* ji bo bexşandina/ji bo efû kirina wana hêvî û mizgînî dide te. Lê belê, tenê bitenê ji xeynî gunehê şirkê!

Belê, min pirsa te seh kir.

Tu dibêjî gelo tu tiştek tune ku bibe kefaret ji guneha şirkê re û gemmara vê cûrma mezin û giran ji holê rake.

Cewab: Ew tişt ev e ku tu bibêji *"La îlahe îllallah"* û aqîdeya xwe yê têwhîdê bi dilbawerî eşkere bikî.

Wextê ku min wisan got di be ku tu ji *"Wey mala te ava be. Min digot qey wê tu dûayekî zehfî dirêj hînî min bikî. Ger mijar ev hevok be ez ji xwe vê hevokê dizanim"* bibêjî û bi vê awayê min heskir ku tu bi vê ramana xwe dilrihet buyî.

Ka tu bêje. Ev kelîmeya ku di oxira wê de cennet hatiye wead kirin û di encamê de jî seyra ce-

malullah wê hebe, qet wisan hêsan/qolay dibe? Em di vê mijarê de mîsalek ji heyata xwe bidin. Kê ditîye ku zêr û zîv û dûrr bi bûhaya dar û êzinga hatiye dayîn û sitendin!

Ji bo malê bê misl û bûha hema bitenê gotina hevokek bes têr dike? Kî dikare vê dozdarîye bide pêş.

Tu jî dibêjî na, ne wisan?

Bûhaya vê malê qethîyen ne erzan e. Allah *azze we celle* ji wî kesê ku vê hevokê bi zimanê xwe dibêjê çi dixwaze gelo?

Pêwistên gotina vê hevokê çi ne? Ew pêxemberê me ku ji bo vê hevoka (La îlahe îllallah Muhammedun Rasûlullah) bist û sê sal şev û roj, çile û havîn, têr û birçî, di şergehê de û di aşîtîyê de bê sekin û be bêhndan heta dawîya jiyana xwe herî daîm xebat kir *aleyhîssalatûwesselam*

Em ê jî ji bo çareserîya pirsgirêkên xwe serî bidin sûnnet û sîyera wî *sallallahu aleyhi ve sellem*.

Heta em têkoşîna/mûcadeleya Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* di oxira vê hevokê de kiriye

hîn nebin û nasnekin emê nizanibin ku bûha û bedela vê hevokê ku ji me dixwaze çiye û çawa ye!

Lewre ew Rasûlullah e *aleyhîssalatûwesselam*, herûdaîm ji me re *“ûswetun hasene”* ye, elhamdulîllah.

Heta ku İblîs û hevalên wî yên li hember aqîda tewhîdê bi korbawerîyekî hefnikî têkoşînê dikin em wana nas nekin emê nizanibin ku ev hevok ji me çi dixwaze, bûha û bedela wê çi ye.

Di nava keviran de bûha û rûmeta almas çibe di nava însanan de jî bûha û rûmeta Muhammed *aleyhîssalatûwesselam* ew e. Bi rastî ev teşbîha ku min da jî pir hêsan maye. Çimkî ew, ji temamê aleman re ji bo bibe rahmet û dilovanî hatiye şandin. Lê ew jî *aleyhîssalatûwesselam* beşer bû. Çima weke me beşer bû? Ji bo ku ji me re bibe minaka herî xweşik, yanê *“ûswetun hasene”*.

Eger ew weke me ne beşer, mesela em bêjin ji melaîketan melekek bibuna wê demê me yê çi bikira? An jî eger heyînîyekî ji xeynî însan bibûna wê em ê çawa bigihiştana wî û me yê menhec û sûnneta wî bişopandana? Ev jî dibe wesîleya

hemdê bê hed bi Allahê alemîn ku Nebî yê xwe *aleyhîssalatûwesselam* ji yekî weki me jî me re şandiye.

De heydê kerem bike em li jiyana Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* binêrin. Umrê Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* çil sal bû. Çil sal ji umrê wî li paş mabû. Pêşeroja wî de bist û sê sal teqrîben umrê wî mabû. Qehr û tengasî hê piştî vê demê jê re bu mêvan. Lewre têkoşîn û mûcadeleya tewhîdê he ji nû da dest pê dikir.

Belê, yek dikare bêje çil salê Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* (Hâşa) di nav şirkê de borîye? Beguman, tu cara kes nikare tiştekî wisan tewşo mewşo bîne ser ziman.

Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* xwedî bawerîyekî tewhîdî bû. Lê belê wî nizanî bû ku vê bawerîyê bi çi awayî bîne ser ziman û vê aqîda mudellel bike, yanê li ser bingeha delîlân eşkere bike. Qur'ana pîroz jî ji vê halê wî û tengasîya wî behs dike. Wê demê Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* li ser tewhîdê bu lê gelê Mekkeyê di nava şirkê de digevizîn. Hemd ji wî Îlahê re be ku di nava ew

qas şirk û neqencîyê de aqîda tewhîdê bi Rasûlê xwe da zanîn û ihya kir.

Di nava wê gelê de hinek kesên din jî hebûn ku ehlê fitretê bûn, henîf bûn. Wan kesan jî carinan ji xwe bixwe re digotin:

*"Hê xaliqê vê kaînatê! Ez dizanim tu heyî. Eger min bizaniba îbadet ji te re çawan tê kirin yek lehzeyekî jî min texîr û texsîr ne dikir û minê bi wî şeklê îbadet ji te re bikirana."*

Tevlî ku gelê wê dewrê bi jimarên xwe zehf û qelebalixbûn û Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* di nava vê qelebalixê de bitenê bu jî dîsa tu cara bi qasê misqalekî ne ketibû gunehên şirkê. Ne bêrî pêxemberîyê de û ne jî piştî rîsaletê tiştekî wisan qet ne qewimîye! Lê ew tewhîd û îmana wî yê berî pêxemberîyê bitenê jê re mabû.

Bi vê awayê ew şahdeyîya ku nikaribû bîne ser ziman zerar nedaye tu kesan. Çimkî beriya pêxemberîyê ne delilên wî yê ku spartekê zanîneke zelal û ne jî hêzekî wî yê ku spartekê quwwetekî saxlem û nelerizandî hebû. Di nava wan çil salan de yek kesekî ku neyartî li wî kiri-

be tune bû. Lewre ew hezkirîyê gelê xwe bû. Bi ewlehî bu û xwedî merhamet bû!

Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* kengê vê şahdehîya tewhîdê anî ser ziman û got *"La îlahe îllallah"* pê de neyartîya qewmê wî û temamê ereban wê bi çi awayê bihata fêmkirin û îzah kirin? Ew qewmê wî yê ku wî binavê *"Muhammedu'l Emîn"* binav kiribûn piştî pêxemberîyê ew bixwe bûn dijberên Rasûlullah û dest bi neyartiya wî kirin.

Belê ew tişt çi bû ku wan kesan kir neyarê *"Muhammedu'l Emin"*?

Ez ji te re bêjim ku ew tişt, mifteya cennetê ye ku mifteya cennetê jî *"La îlahe îllallah"* e.

Belê, tu jî heyîrî mayî ne wisan? Tu jî di bêji *"ev çi îşe gelo?"* Belkî wê tu yê wiha jî bêjî:

*"Evê ha mijarekî pir xerib e. Wê tu yê banga cennetê li însanan bikî û di muqabilê wê de ji te re neyarti bê kirin!"*

Erê birayêmin.

Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* bang dikir digot:

*"Bêjîn La ilahe illallah û tevde xelas bibin û bikevin cennetê".*

Însanên li hemberî wî jî lingê xwe didan erdê û digotin:

*"Na, na! Em vê dawa te qebûl nakin, belê em dixwazin biçin cehenneme!"*

Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* derîyên cennetê nîşanî wan dida, lê ewana derîyên cehennemê li ser xwe vedikirin.

Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* wana gazî rizgarîyê dikir lê ew însan ji bo bibin êsîrê cehennemê li ber xwe didan û wan kesên li dora xwe jî bi xwe re dikişkişandin cehennemê ve!

Pêxemberê me di nav qewmê xwe de rojên zehfî giran derbas kir. Lê belê wî qenc dizani bû ku cehennem ji van zorîyan herî zor û dijwartir e. Ji ber vê yekê wî qet guhê xwe ne dida wan îşkenceyên ku lê dihatin kirin.

Wan muşrîkên neyarên îslamê lê meyizandin ku bi îşkenceya û bi zordestîya nikarin pêşiya vê daweta tewhîdê bigirin dest bi hîle û pîlên din

kirin. Hileyekî wan jî ev bû ku dixwestin rêyekî lihevkirinê derêxin holê.

Kemîn û xefikên muşrîkên wê dewrê çawa zêde bûn, kemîn û xefikên çêliyê wan ên îro jî bê serî û bê binî ye. Ev gelê ku em di nava wan de dijîn mixabin ketinê feq û dafikên van muşrîkên modern. Ev jî nêz bûna şeytan ya ku ji milê rastê vê nêz dibe ye.

Bala xwe bidê, birayêmin!

Alîyê ku şeytan nêzi însan bibê yê heri xetere/taloke aliyê rastê ye.

Çima?

Dema ku ji aliyê rastê ve nêz dibe amel û aqîdeya pûç û betal di nav libasên heqqê de teqdîm û nîşan dike. Mirov di nava batılê de noq dibê le ew liba xwe dibêje *“ez tabî û hamî yê heqqê me!”*

Çimkî şeytan, batıl weke heq, heq jî di sureta batıl de nîşan dide.

Carekî bifikre. Mirovekî ku qansêr lê ketibe û haya wî ji vê nexweşîna wî yê giran tune be, çi qas

tiştekî dilêşî ye ne wisan? Mirovek jî li ser rêşaşîyê û jiyanêkî di nava kûfrê de ku bi her pêgavekî roj bi roj dem bi dem xwe nêzi cehennemê dike, digel vê yekê xwe ji cennetîyan dihesibîne û bi hinek gumreşîya mijûlayîya xwe dike, çi qas tiştekî xerab e.

Hela roja qiyametê dema ku li hêvîya mizgînîya cennetê mabe û piştre bibe êzingê cehennemê çi tiştekî erjeng e/dehşet e. Allah *azze we celle* em û te me tev de biparêze.

Herwiha ez ji te dixwazim tişten ku ez ê ji te re bêjim bi baldarî li min guhdar bibî.

Erê...

Muşrîken Mekkeyê ji bo pêşniyarîya lihevkirinê li ber deriyê Rasûlullah in *aleyhîssalatûwesselam*

Pêşniyarîya xwe bieşkerehî û bizelâlî xistin holê. Pêşniyarîyekî wisan kirin ku mirovekî ji rêzê nikare bi hêsanî bêje na. Ewan muşrîkan wiha digotin:

*“Hê Muhammed!*

*De were em navbêra xwe çêkîn. Ew qas neyartî*

*bila bes be û xwîyna rijandî bila bisekine. Di nava qewmê me de wekî demên borî aşîtî û aramî û ewlehî bibe hakim. Kîn û edaweta bira ji bira re bila biqede. Sedema hatina me yê cem te ev e ku, tu îro ji me her çi bixwazî em ê bidin te. Em ji bo vê yekê li hev civiyan û hatin ber derîyê te. Eger tu xwedîtî û serwerîyê dixwazî werê em te bikin mezinê Mekkeyê, da ku hûr û gîrê me bi temamî ji te re sertewandî bin û îteata te bikin. Ger daxwaza te mal û milk e, em mal û milkên wisan bidin te ku tu bibî herî dewlemendê di nava me de.*

*Ger kûl û derdê te jinên Mekkeyê, yên xweşik bin ji me re bêje, da ku em di nava vê bajara Mekkeyê de jinê herî xweşik û zayend û zadegan kê be wê bi te re bizewicînin. Nexêr, kûl û derdê te ne ev bin, ger nexweşîyek be, ji me re bêje da ku em çi qas hekim û tabibên li ser rûyê erdê hebin wan ji te re bînin ji bo tu werî ser xwe û şîfa bibînî.*

*Lê belê em ji te lava dikin tu vê tova bêaramîtî û dûbendîtîyê tune bikî, biqedinî! Em û te di navbêra xwe de peymanekî deynin. Salek tu ji putên (ji xwedayên) me re îbadetê bike, salek jî*

*em ji Rabbê te re îbadetê bikin. Hema dibe ku di xwedayê me de xêr hebe wê tu yê jê sûd/feyde bigiri. Eger di xwedayê te de xêr hebe emê jî je sûd/feyde bigirin. Lê em dîsa carekî din ji te lava dikin, ev dijminahîya di navbera me de êdî bila biqede!"*

Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* bi sukûnet û metanet guhdarîya wan kir. Piştre ji wan re wiha got:

*"Xwe wisan neperitînin. Ne hewceyî ew qas tiştan e. Tiştê ku ez ji we dixwazim gotina yek kelîmeyek e. Bêjin û xelas bibin!"*

Mezinên muşrîkên Mekkeyê piştî vê gotina Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* pir şaş bûn. Li hember pêşniyarîya wan Muhammed *aleyhîssalatûwesselam* ji wan gotina yek kelîmeyekî dixwest.

Ji Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* re gotin:

*"Hema ne kelîmeyek ger dixwazî em ê hezar kelîme bêjin. Bes tu ji vê doza xwe bibore!"*

Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* wextê ku ji

wan re got *“Bêjin, La ilahe illallah Muhammedun Rasûlullah û xelas bin”* ew muşrîkên ku ji bo peşniyarîya lêkhatinê hatibun ber derîyê Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* çawa vê kelîmeyê seh kirin wekî ku cin ji hesin dûr dibe ji wê derê bi bez û rev dûr bûn.

Bi kîn û edaweta xwe yê dijwar dûr bûn. Piştî vê hatin û bi rev dûrbûna wan çend carên din jî hatin cem Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam*. Pêşniyarîyen xwe li pey hev dianîn ser ziman. Cara dawîyê Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* vê bersivê da wan:

*“Ger hûn rojê têxin destê minê rastê û hêyvê jî têxin destê minê çepê ez tu carî ji vê da’wa xwe naborim!”*

Piştî vê hedîseyê ev ayetên pîroz nazil bûn û bi vê xîtaba îlahî pêşniyarîyê wan a lêkhatinê hûr û hela bû, ket binê erdê.

قُلْ يَا أَيُّهَا الْكَافِرُونَ ﴿١﴾ لَا أَعْبُدُ مَا تَعْبُدُونَ ﴿٢﴾

*“Bibêje: Hê gelî kafiran! Ew (put û sanem) ên ku hûn îbadetê wan dikin, ez îbadetê wan nakim”*

Belê birayêmin.

Çawa ku tu ji dibînî bûyer/ hedîse zehf bi eşkerehî û bizelalî li holê ye. Ez dixwazim di vê beşê de behsa wan kesên di rêyekî şaş dene û di nava sîstema şirkê de cih girtine di ser de jî ku dibêjin *“em vê yekê ji bo Îslamê dikin (!)”* bikim .

Ez ê di navbera tevgera wan û bersiva Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* de (ku ji muşrîkan re dabû) qiyasekî bikim. Îro gelek mijulayî di nav însanan de digerin. Ev gotin muheqqek hatiye ber guhê te jî. Wiha tê gotin:

*“Ma em bihêlin bila meydan ji wan re bimîne?”*

*“Ez nexwîynim, em nexwîynin, tu nexwîyne… Belê wê ji me kî bibe dextor û mamoste û muhendis?”*

*“Em zarokên xwe bihêlin ber destê çepgir û kemalîstan qenc e an jî bihêlin ber destê wan kesên rûbinûr û nimêjkeran qenc e?*

*“Em çawa bikin, em mecbur in ku di nava xeraban de qencê xeraba bineqînin.”*

*“Ger îro daxwaza me hakimîyeta îslamê be em mecbur in pêşî îdareya welat bixin dest. Ji xwe*

*ku îdareya welat kete destê me her tişt wê hêsan bibe. Wê gavê em ê qanunên li gorî emr û nehyê Allah azze we celle bikaribin çêbikin."*

*"De tu ji ewqas ser xwe de neçe birazî/xwarzî... Tevgera wiha ne baş e. Ka îro li vê welatê kî têkilî nimêja te dibe? Lê binêrê derîyen mizgeftan heta piştî vekirî ne. Pênc wext banga şerîf ji ser me kêm nabe. Şixulkerên daîreyên dewletê jî ji bo nimêja înê bi destur in. Ewan rojên îyd û cejnên Remezan û Qurbanê tatîl in. Herwiha hûn jî zêdetir nexwazîn, ev serxweçûn e!"*

*"Hema wê bêjin ev şirk e û ew şirk e... Başe, lê em ê aborîya xwe bi çi bikin û çawa bikin? Eger bi we mabe her tişt şirk e."*

*"Erê, hûn dibêjin dewlet Taxut e. Lê fersend bikeve destê we, ji kêranîn û menfeata xizmetên dewletê qet li paş namînin. Belê, madem ev dewlet taxut e, ji xestexanên wî û ji postexanên wî û ji xizmetên şaredarîyên wî îstîfade nekin."*

Birayêminê hêja.

Ev û wekî vana belkî bi hezaran gotin di nava însanan de bi gotegotî digerin. Bizanibe

ev gotegotên wana, ji telbîsatên şeytan pê ve ne tiştekî din in.

Ev gotinên hanê, ne ji îmanekî li gorî Qur'anê ye. Bilakis ev, ji îmanekî bi dîtina ji bav û kalan û ji dîneke ku bi pîvika mentîqê hatîye peydakirin derdikeve û belav dibe. Ew îmana ku bi pevşêwrîtîya Qur'an û sunnetê derketibe meydanê ji van gotegotan dûr û zelâl e. Lewre gotegotên wisan pûç û beredayî ji devê yek muslîmekî ku Qur'an û sunnetê baş bizanibe qet dernakeve. Ez vê yekê jî bînim berçavê te. Ev gotegotên hanê carinan sirf ji bo zihnên mirovan bikin weke hewdelê tên belav kirin. Hin carinan jî bi niyeteke qenc ev gotegotên pûç tînin ser ziman.

Lê bila baş bê zanîn ku her bi çi nîyetê ev gotegot bên gotin ev hevok dibin sebebê xezeba Allah *azze we celle* Bila ev heqiqet jî qet neyê ji bîr kirin ku, bi nîyeta xerab amelekî bi xêr fasid dibe. Lê bi hûsnû nîyetê amelekî xerab navegere amelekî salih. Allah *azze we celle* me bitemamî ji wan kesên ku di nîyeta xwe de xalîsîn û di amelên xwe de jî salihin binivîse, înşaallah.

Binêre birayêmin!

Allah *azze we celle* wiha ferman dike:

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُواْ أَطِيعُواْ اللّهَ وَأَطِيعُواْ الرَّسُولَ وَأُوْلِي الأَمْرِ مِنكُمْ فَإِن تَنَازَعْتُمْ فِي شَيْءٍ فَرُدُّوهُ إِلَى اللّهِ وَالرَّسُولِ إِن كُنتُمْ تُؤْمِنُونَ بِاللّهِ وَالْيَوْمِ الآخِرِ ذَلِكَ خَيْرٌ وَأَحْسَنُ تَأْوِيلاً ﴿٩٥﴾

*"Gelî yên ku îman anîne! Îteatî Allah bikin û îteatî Pêxember bikin û (îteatî) ululemrên (mezin û serokên) ji xwe bikin. Eger hûn li ser tiştekî lihev nekin û hûn eger bi Allah û bi roja axiretê bawerî tînin wê meselê bibin bal Allah û Rasûlê wî. Ev bi xêrtir e û bi encama xwe herî xweşiktir e."*

Ev ayet ji me re vê emrê dike:

*"Dema hûn liqayî pirsgirêkekî bibin, wê pirsgirêkê bibin cem Allah û Rasûlê wî, yanê teqdîmê Qur'an û sunneta Rasûlullah aleyhîssalatûwesselam bikin. Ji bo vê jî wê pirsgirêkên xwe bibin cem alim û serokên xwe yên ku bi dilsozî tabîê Qur'an û sunnetê ne."*

Niha emê waqiayên xwe bidin ber çavan.

Em dibêjin *"em muslîm in"* û dozdarîya îmanê dikin. Ka cihê vê ayetê di heyata me de heye gelo? Ew pirsgirêkên ku di heyata me de dertên pêşiya

me ji bo çareserîya wan em li gorî vê ayetê tevdigerin?

*“Gelo ev Qur’ana pîroz di der heqê van pirsgirêkên min de çi ferman dike? Çareseriyek ji min re wê hebe?”*

An jî li hember van pirsgirêkên me rojekî em serdanê didin sûnneta Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam*?

Ka, em dibêjin: “Ji bo vê derdê xwe ez binerim, pirsa xwe bikim û tehqîq bikim da ku reçeteya şîfayê ji sunneta Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* bibînim û vê derdê xwe derman bikim?”

Nexwe me terka sitendina çareseriyên xwe ji çavkanî û membaa eslî kiriye û piştre jî berê xwe daye hin derîyên şikestî û zengoratî!

Tu ji baş dizanî ku çawa nexweşînê bedena însan hebin weke vê nexweşînên qelbê jî zehf in. Ji bo şîfayê bibînî tu diçî cem tabib û dextoran. Ji bo ku bibe wesîleya şîfayê tabib reçeteyekî dinîvîse û dide te. Tu jî wê reçeteyê digirî û dibezî eczexaneyekî.

Dermankar wan dermanên ku li ser reçeteya te nivîsî ye dide te û emilandina wan dermanan ji te re terîf dike. Terîfa emilandina dermana li ser wana jî dinîvîse. Tu jî van dermanê xwe di wextê wî de û bi pîvana ku nîşanê te daye vexwî. Bi vê awayê jî înşaallah wê tu bigihîjî sihheta xwe.

Belê...

De ji kerema xwe re dikarî ji min re bêjî ji bo bigihîjî sıhheta xwe tu çima bitenê bixwendina reçeteya xwe bes nakî? An jî wê reçeteyê li situyê xwe naeliqênî? Herwiha tê fêmkirin ku neheqîyekî pir mezin li Qur'ana pîroz tê kirin, ne wisan?

Ez seh dikim ku tu dibêjî:

*"Erê, erê bira...*

*Belki te kêm jî gotibe, lê te qet zêde nekir. Eynî weke te gotiye..."*

Ew reçeteyê tabibekî nivisîye ku ew jî însan e... Kesê nexweş heta wan dermanên li ser reçeteyê nivîsandî ne sitêne û ne amilîne herkes dizane ku ew kesê nexweş baş nabe/sax nabe. Ê baş e,

ev însanên ku vê yekê dizanin çima ew Qur'ana ne ji mirîyan re, ji zindîyan re nazil bûye bitene wê bi erebîya wî bixwîynin û wê li hêvîya derman û xelasîyê bimînin? Vêya jî ne zulmek e ku li Qur'anê hatiye kirin e?

Bizanibe!

Herûdaim ew ê ku şîfayê bide nexweşînên me yên qelbî û bedenî bi navê xwe yê *"Şafî"* Rabbê me ye.

Reçeteya ku ji me re daye nivîsandin û şandîye Qur'ana pîroz e, ku ruh û dilan têr û qewî dike.

Ew dermankarê ku dermanên di nava vê reçeteyê de nivîsîye ji me re amilandina wî nîşan bide û hîn bike jî Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* e. Tevlî ku çavkanîyekî wisan bê misil û bê buha di destê me de belê em çawan û çima ji vê menbaa şîfayê dûr ketin?

Çima gelo?

Lewre ji me re wiha dihat gotin:

*"Hûn ji vê kitêbê qet nikarin fêm bikin. Bitenê ew meleyên giregir û bişaşik ji vê kitêbê bikaribin*

*fêm bikin. Hûn kî nê û fehmkirina vê kitêbê ma li ku?”*

Ji te re jî wiha gotin, ne wisan?

Tê bîra te, hê dema zaroktîya te de, te ji vê kitêbê tirsandin!

Em biçuk bûn, zarok bûn me nikaribu destê xwe bidin Qur’ana pîroz. Ji me re digotin:

*“Destê xwe nede wê (Qur’anê) nexwe wê xwedê te di nava agir de bişewitîne!”*

Em mezin bûn ji me re gotin *“Lawê min, qîza min, hûn nizanin, hûn fêm nakin.”*

Heta ku vê Qur’ana pîroz kirin hevoka nifiran:

*“Qur’an li te bixe!”*

Na, birayêmin, na!

Qur’an lêdanê li kesekî naxe. Hela ew kesên ku bi dilekî vekirî û bi dilsozî bên alîyê wî, Qur’an ji wan re dibe nûr, dibe hêz, dibe hêval, dibe rêzan û yarekî xweşewîst.

Carinan jî li mirov dixe. Lê ev lêxistina wî ne ji

bo kuştinê an ji bo şehtkirinê ye, bes ji bo wî kesê vegerîne jiyanê...

Bi jiyanekî nipînû!

Ev jî qet êş û elem nade însan. Bilakis êş û elemên însana dihedinîne. Ger ev Qur'ana pîroz ne kitêbekî eşkere bûna Allah *azze we celle* di gelek ayetan de wiha ferman dikir? Binêre, misalekî ji Qur'anê bidim te ku Allah *azze we celle* bi kîja taybetiya Qur'anê qesem dike:

حم ﴿١﴾ وَالْكِتَابِ الْمُبِينِ ﴿٢﴾ إِنَّا أَنزَلْنَاهُ فِي لَيْلَةٍ مُّبَارَكَةٍ إِنَّا كُنَّا مُنذِرِينَ ﴿٣﴾

*"Ha. Mîm. Bi wê kitêba mûbîn (eşkere) sond dixwim ku; me ew di şeveke pîroz de nazil kirîye. Lewre em bi wê (însanan) hişyar dikin."*

Allah *azze we celle* ev kîtêba hanê ji me re vikîvekirî şandîye. Kesên ku dibêjin *"hûn fêm nakin, em fêm nakin"* ne rast dibêjin. Ew kesên ku wiha diaxivin vir û derewan ji xwe re kirine wird û tesbîhat!

Vaye tu jî dibînî birayêmin.

Qur'ana pîroz eşkere û zelâl e. Bi tu awayî ne

girtî û ne jî veşartî ye. Lê belê tu jî dizanî her firaxek li gorî gencena xwe, yanê bi qasî kapasîteya xwe av distîne.

Ji Qur’anê jî her mirovek bi qasî nesîbê xwe pay distîne. Lewre xwendin û xebata fêm kirina Qur’anê çuqas zêde be îlm û fîraseta mirov jî ewqas wê pêş ve biçe, înşaallah.

Û dîsa ji me re digotin:

*“Heydê, nesekinin, Qur’an bixwînin”*.

Bixwînin, lê belê xwendineke çawa?

Xwendineke netemam. Ne fêhm û ne îdraq. Xwendineke zipîziwa.

Ewan kal û pîrên ku rojên xwe li hewşên mizgefta derbas dikin û virdên xwe yên rojane berdewam dikin, tu pirsgireka şeytan bi wan re tune ye. Şeytan wê çi bike ji wan kesên ku di rojekî de sûreyên Ya-sîn û Amme yetesaelûn û tebarekê dixwîynin û ji xwendina xwe qet tiştekî fêm nakin!

Bawer bike ev şeytan hê bêtir dixwaze ku van sûreyan zehftir bixwînin. Bila ji xwendina xwe

qet tiştekî fêm neke, hema çuqas dikare ewqas bixwîne, zerar tune û ferk ji nake!

Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* ji me re wiha nabêje?

*“Qur’ana nefêmkirinê bê xwendin xêr tê de tune.”*

Erê, bêguman Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* rast gotîye. Ka tu jî bifikire... Qur’ana ku bi nefêmkirin bê xwendin wê çi feyde bide?

Bizanibe ku ev Qur’an ji bo te rêber e.

Rêzana hîdayetê ye. Ev rêzan û rêber wê bi te bidin zanîn ku wê tu li vê dinyayê çawan bivejî û ji bo bigihêjî cennetên bêdawî çi lazim e.

Ji bo Qur’anê mînakekî xweşik heye. Em ê Qur’an wekî nameyekî/mektubekî binav bikin. Ev name ji wî yê ku Wedûd e *azze we celle* hatîye. Wedûd ew e ku; ji evdên xwe pir hez dike û ew jî herî layiqê hezkirinê ye. Name, nameyekî herî xweşik e.

Em bibêjin, dostekî te heye. Gava ku tu wî nabînî bêrîya wî dikî, dengê wî sehnekî dilê te

teng dibe, kesera wî kezeba te dişewitîne, yanê tu zehf hez jê dikî. Nameyek/mektubek ji vê dostê te hat. Dema ku mektup ket destê te ji kelecanê hindik mabû te wê zerfê biçiranda. Piştî ku te zerf vekir, wê lehzê mektup bidî deste xwe û dest bi xwendinê bikî ne wisan? Helbet wisan e. Herê, em bêjin wî dostê te mektuba xwe bi zimanekî ku tu pê nizanî, mesela bi zimanê ingilîzî nivîsandiye. Lê belê tu jî bi zimanê ingilîzî nizanî. Qet nebe wê tuyê çend caran çavên xwe li ser vê mektubê bigerînî, ji bo ku tiştekî jê fêm bikî:

*"Gelo ezê bikaribim hema çend kelîmeyan fêm bikim da ku hesreta min bibore."*

Piştre wê tu çi bikî? Di be ku tu bibêjî*: "Ji xwe ez jê fêm nakim"* û vê mektubê bavêjî keviyekî?

Nexwe çuqas dûr be jî wê tu wergêrek/tercûmanekî bibînî û tercume bikî. Bivê awayê wê tu yê li hember vê hezkirina hogirê xwe/dostê xwe bi hezkirinekî qewî mûqabele bikî. Tevgera te yê bi vê awayê ji bo te izzet û rûmet e. Ev çuqas karekî bi zehmet û bi kulfet bibe jî wê tu yê wisan bikî.

Herê birayêmin.

Ka bêje, ev mektuba Qur'anê ku ji Rabbê alemê; ji xwedîyê qelbê te, ji hakimê jiyana te, ji ew ê ku te xuliqandiye, ji ew ê ku te divejîne, ji wî yê eger temamên dost û muhibên te terka te bikin jî ew ê ku terka te neke, wextê ku tu biterpilî ji destê te digire û te radike, heta wekî ku toz û telazên li ser te bê weşandin te ji gûnehan pakij dike... Mektuba ku jê hatiye bi gotina *"ev mektup bi zimanê Erebî ye, welle ez jê fêm nakim"* tê çawa bavêjî quncekî xalî û piştguh bikî?

Ma qîmet û rûmeta Rabbê alemê li cem te bi qasî wî hogirê te/dostê te jî tune?

Ez seh dikim ku tu dibêjî:

*"Helbet heye, ma divê mijarê de qet pîvek û qiyas çedibe?"*

Herwiha ev nameya ku bi zimanê pêxemberekî pîroz gihaye te qedrekî pir mezin bidê. Ev kîtêb; ya wê ji te re şefaat bike yan jî wê gilîkarê te be û gazinan ji te bike. Allah *azze we celle* vê yekê di Qur'anê de ferman kiriye:

*“Hûn mesul in, hûnê hisab bidin!”*

Nexwe nesekine.

Eger tu ji zimanê Qur’anê fêm nakî aniha Meala Tewhîdê bide destê xwe û ji bo fêmkirina Qur’ana pîroz dest bi xebatê bike.

Tu çawa bixwazî wisan bixwîne.

Te divê ji ser de dest bi xwendinê bike. An jî tu bixwazî ji dawîya Qur’anê dest bixwendinê bike.

Qet ferq nake.

Ger dixwazi ji Meala Tewhîdê rojê meala cizûyekî bixwîne an meala sûreyekî an jî meala yek ayetekî bixwîne. Lê qethîyen divê ku tu bixwînî. Lewre vê heqîqetê qet ji bîr neke ku wehîya yekemîn ji Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* re hatibû, Allah *azze we celle* wîha ferman dikir:

*“Bixwîne!”*

Bala xwe qenc bidê! Fermana îlahî a yekemîn ne nimêj e û ne rojî û ne jî zekât e...

Ev e:

*“Bixwîne!”*

Fêm dibe ne wisan?

Helbet ev nayê maneya ku tu nimêj nekî û rojî negiri. Bila bi şaşîtî neyê fêmkirin. Nimêja xwe bike û rojîya xwe bigire, lê bixwîne jî.

Tu cara nexwendinê neke.

Lewre ku însan nexwîne dibe êsirê nezanîn û cehalet ê. Li hember heqqê diberize!

Tu dixwazî her dem hevalekî hişyar bi tere be û her lehze şîretan li te bike. Dema ku tu bikevî nava çerxû vajekî wê tu bixwazî hogirek/dostek li cem te hebe. Vaye ji tere hogir û kelîmeya hogirî!

Nexwe li çi mayî sekinî?

Heydê, dest bi xwendina nameya dostê hêja û xoşewîst bike, pê re jî fêm bike û tiştên ku te fêmkir bi dilsozî, bi îxlas têxe heyata xwe.

Lê vêya jî ji bîr neke.

Wextê te dest bi xwendinê kir ji şerrê şeytanên îns û cinan xwe bispêrê Allah *azze we celle*.

Binêre, Allah *azze we celle* di ve mijarê de wiha ferman dike:

فَإِذَا قَرَأْتَ الْقُرْآنَ فَاسْتَعِذْ بِاللّٰهِ مِنَ الشَّيْطَانِ الرَّجِيمِ ﴿٨٩﴾

*“Dema ku te dest bi xwendina Qur’anê kir, peşî xwe ji (şerrê) wî şeytanê ricimandî bispêre Allah.”*

Çimkî gava tu dest bixwendina Qur’anê bikî ew şeytan wê wesweseyên cûrbicûr bide qelbê te. Wê ji te re bêje:

*“Ka tu çi ji vê Qur’anê fêmdikî?”*

*“Binêre, eger tiştekî bi şaşîtî hîn bibî wê tu ji dînê îslamê derkevî ha!”*

*“Hê hişsiviko! Ji bo fêmkirina vê kîtêba pîroz hê divê tu çend tenur nan bixwî ”*

Û hê tiştên weke vê wê bi gelek hezeyanan weswese bide te.

Tu qet zen neke ku wextê Qur’an bixwîynî şeytan nêzîkê te nabe.

Şeytan asıl dema ku tu Qur’anê bixwîynî wê nêzikêtê bibe û wesweseyan bide te. Hela ku te dest bi fêmkirina Qur’anê kiribe wê şeytan dîn û har be. Lewra wekî ku min berê jî ji te re gotibû şeytan ji xwendina bêfêmkirin qet aciz nabe.

Ew kalê pîr ku pênc ferz nimêja xwe li mizgeftê dike, tiştekî ji xwendina xwe fêmneke jî Qur'anê dixwîne lê belê ji dinya xwe qet tawîz nade, ka wê şeytan ji çiyê wî aciz bibe? Tu zerar û xesara wî kalî li enîs û cenîsê şeytan nabe wê çawa ji şeytan re hebe.

Lê ev kalê pîr bi heyl û quwwetekî li ber xwe bide û ji bo fêmkirina Qur'anê bixebite wê çaxê şeytan wê ji qehra bifetise û biteqe.

Ger dixwazî ji bo vê mijarê baş fêmbikî em bihevre derkevin gerê.

Em bêjin şofêrekî me heye û ew ê me bi qeflekî re derêxe gerê. Wextê mirov bi wesayîtan di rê de diçe wekî tu jî dizanî li ser rêyan gelek lewheyên hêl nîşan didin hene. Em bêjin ji wan lewheyan yek derket pêşiya me. Li ser jî wîha dinivîse:

*"(Dîqat!) Bala xwe bidin!*

*Ji vê dere 15 km. şûn de kortalek heye, dibe ku hûn tera bibin!"*

Em bêjin şofêrê me bisekine û bi awayekî baldarî vê nivîsê bixwîne û bixwîne. Bi xwendinê jî bes neke û ji rêwingên/ji yolcîyên xwe re jî bêje:

*“Kerem bikin, hûn jî vê nivîse bixwînin. Ev nivîs pir bi qedr e, heta ji we tê hûn jî bixwînin”* û me teşwîq bike da ku em jî wê nivîsa lewheyê bixwînin.

Em vê nivîsê gelek caran bixwînin û carekî din lê bizivirin û dîsa bixwînin... Hetanî em wê nivîse ji ber bikin vê xwendinê dubare/tekrar bikin.

Ji bo ku nivîsên li ser lewhayê baş nayê xwendin şofêr wê lewhayê bi yeke qenctir digewirîne. Pişti vê qasî êdî çi pêwiste ji bo me û ji bo şofêre me? Piştî xwendina wê nivîsê lazım dike ku em yek pêgavekî din pêş ve neçin, ne wisan?

Lê belê tevli vê xwendina nivîsa lewhayê ger em vê nivîsê fêm nekin an em fêm bikin û pêre dîsa bi pêş ve li rêya xwe dewam bikin û guhê xwe nedin wê nivîsê?

Tevlî vê nivîsa lewhaya hişyarîyê Allah *azze we celle* hişyarekî din jî derêxe pêşiya me. Ev hişyar gazî me bike û me biseknîne. Ji me re bêje:

*“Bira xêre li we? Hûn bi vê halê xwe bi ku derê ve diçin?”*

Piştî vê pirsa wî jî şofêrê me bersiva wî bide, lê ev şofêr ji xwe gelek qaîl e:

*“Ev cûwamêrên hanê rêwingên min in. Em derketine gerê”*

Li hember vê bersivê ew hişyarê ku li ser rê me sekinandîye vê pirsê bike:

*“Erê, we lewhayê hişyarîyê qet nedît?”*

Şofêrê me dîsa bi quretî bersiv bide:

*“Çawa me ne dît? Belê me dît û me xwend û heta hinek ji me jî bun hafizê wê lewheyê. Xwedê ji xêrê dernexe, eşkere kirina tiştên wisan ne başe lê me ew lewhe bi yeke qenc û nipînû re gewisrand”*

Dema ku şofêr vê bersivê da ew hişyarê li ser rê me sekinandî wê wisan nebêje:

*“Hevalno!*

*Belê, we ewqas xêr kirin lê belê we maneya wê nivîsa li ser lewheyê nivisandî fêm nekir?”*

Wê eynî wiha bêje û vê gotina xwê wê bi şaşîtî bêje û wê li vê sersarîya şofêr û me ecêb bimîne.

Li gorî qeneeta min ne neheq e. Lewre di xwendina nefêmkirî de qet xêr tune. Gotinên min, qenc fêm dibe, înşaallah.

Lê tu dixwazî were em hinek li ser xwendina me yê Qur'anê bisekinin. Em ê li ser vê minakê dest pêkin.

Em jî îro lewheyên li pêşîya xwe dixwînin.

Hinek ji me bi şev û bi roj dixwînin.

Ya-sîn'a dixwînin û Tebarika dixwînin û ammeyetesaelûna dixwînin...

Heta gelek însan van sûreyan ji ber dikin û bûne hafizê wan sureyan. Ev sûreyên hanê her gav her seet me hişyar dikin:

*"(Diqat) Bala xwe bidin! Cennet...*

*(Diqat) Bala xwe bidin! Cehennem... Hisab... Ezab... Mukafat!"*

Ji bo me ji cehennemê biparêze û beraliyê cennetê bike wisan diqîrîne.

Lê ka wê ji vê qîrînê kî fêm bike.

Lewre ekserîyetê însanan ji van ayetan rûyê

xwe vegerandine. Ew ên ku van ayetan fêm dikin jî bi qelem û kelamên xwe xulamtî ji taxutan re dikin. Bûne çêlî û cewrikên Bel'emê kurê Baûra.

Ji ber ku gel, van lewheyan, yanê bi gotineke eşkerehî em bêjin, van ayetan dixwînin û tiştekî fêmnakin mixabin ber helakê ve hinek ji wan dimeşin û hinek ji wan jî dibezin... Lê ew jî nizanin bi ku derê ve diçin!

Dibêjin nîyeta me xalis e, qenc e, lê amelê wan amelên muşrîkan û yên kesên ehlê cehennemê ye. Tu lê dinêri hinek mirov dertên, Qur'ana pîroz û mealên wê çap dikin, ji bo weşandin û belavkirina wê xebat dikin lê hûkme wê nizanin, ji naveroka Qur'anê bê xeber in.

Erê, birayêmin.

Ev mînakên hanê ku em bi van mînaka her roj rû bi rû dimînin, mînakên ji bo ku qedrê xwendina Qur'anê, xwendineke bîrewerî bi te bide fêmkirin, min hilbijartin.

Êdî ji îro pê de bi xwendina Qur'anê wê tuyê ne tenê xwendineke ziwa fêmbiki înşaallah.

Wextê behsa xwendinê hate holê lazime ku ev jî bên bîra te:

Xwendin; fêmkirin e...

Xwendin; vejîn û heyat e...

Xwendin; zanîn e...

Xwendin; teblîx e...

Xwendin; hêz e, quwet e...

Xwendin; hezkirin e...

Xwendin; eşkerehîya îman û aqîdê ye...

Xwendina Qur'anê, ji bo numûne bûna ji însanan re pîvan e.

Bawer bike, wê tuyê bi van re bextewar bibî.

Van ayetan ku bifêmkirin bixweynî wê tu piştgirîya gotinên xwe yê li ser mijarên îslamê bi vê bikî. Di vê mijarê de hedîsên Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* em dizanin ku jiyana wî Qur'an bixwe ye, wê ji te re bibin hewl û piştgirî înşaallah. Lewre Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* di mijara fêmkirin û tetbîqa Qur'anê de ji bo muvahhîdan mîsalekî xweşik û zindî ye.

Birayêminê hêja.

Li ser vê mîsalê ez ê ji te re hedîsekî Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* bibêjim. Li ber ronahiya vê hedisê ev gelê ku em jî di nav wan de dijîn bihevrebûna wan û Qur'anê ji me re eşkere dike.

*"Ji nava we komek mirov wê derkevin. Hûne nimêja xwe li ber nimêja wan, rojîyên xwe li ber rojîyên wan û amelên xwe li ber amelên wan herî biçuktir bibînin. Ew, Qur'anê dixwînin lê Qur'ana ku dixwînin ji qirika wana berjêr nabe. (Bitenê wê bînin ser ziman û hew!) Herwiha ew kesan çawa ku tîr ji kevan difilite wê ji dîn (ji îslamê) derkevin."*

Sûbhanallah!

Te seh kir birayemin?

Ev mirovên ku Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* behsa wan dike di jiyana wan de nimêj heye, rojî heye heta amelên ku dikin jî bê kêmasî ye. Madem rewşa wan wisan e çima gelo, wekî ku tîr ji kevan difilite ji dîn derdikevin?

Ne zêde, yek bersiva vê pirsê heye. Çimkî ew,

Qur’ana ku dixwînin naxin heyata xwe, pê amel nakin.

Qur’ana di malan de têxin hewleqên neqişkirî û yên heri xweşik. Qur’ana xwe di nav xaniyên xwe de li cihêkî herî bilind digirin.

Lê ew Qur’an ji hewleqan dernakeve û nakeve jiyana kesanî û ya malbatî û ya civakî û ew Qur’an ji ser dolav û dîwarên bilind berjêr nabe û nakeve odeyen mê û kolanen mê û sûkên me û kargehên me û dikanên me.

Çimkî ew kes, wan ayetên ku taxuta red dike dixwînin, lê xwe ji wan taxutan dûr nakin. Carinan dibin xulam û qerwaşên taxutan, carinan jî ew bixwe dibin taxut!

Hûkmê îlahî ku dibêje *“Hakimiyet tenê bitenê yê Allah e”* lê ew ê ku şev û roj Qur’anê dixwînin muxalifê vê hûkmê tevdigerin. Diçin haqqê Allah *azze we celle* li cem xwe betal dikin û vê heqqê didin komek mirovan. Ew dibêjin *“Hakimiyet bila bitenê ê gel be”*.

Ayeta Qur’anê ferman dike:

*"Nimej ji temamê xerabî û çepelîyan dûr dike"*.

Vê ayetê dixwînin û di yek nimêjekî de bîst car dibêjin *"Allahuekber!"* Yanê *"Yê herî mezin Allah e!"* û piştre jî diçin hinek mirovan an jî tiştên din ji xwe re mezin qebûl dikin û xwe bi wan digirin.

Qur'an dibêje *"Allah ji te re wekîl e û bes!"*

Ew vê ayetê jî dixweynin lê li gorî vê ayetê hereket nakin. Vaye em dibînin, serê çend salan carekî ji bo hilbijartinên demokratîk wê bikişin serê sandoqan. Bi vê çûna xwe ji xeynî kîtêba Allah *azze we celle* yanê ev Qur'ana ku ji bo heyatê nazil bûye wê biterikînin û ji bo jiyana xwe hin kîtêb û qanunên nû çêbikin wê ji xwe re wekîlên nû hilbijêrin. Sebebê wê qawmê ku ji dîn derdikevin yek jî ev e.

Allah *azze we celle* wiha ferman dike:

فَلاَ تَخْشَوُاْ النَّاسَ وَاخْشَوْنِ وَلاَ تَشْتَرُواْ بِآيَاتِي ثَمَنًا قَلِيلاً... ...

*"...Ji însanan netirsin, ji min bitirsin û ayetên min bi bûhayeke erzan/kêm nefiroşin..."*

Ew kesên ku vê ayetê dixwînin û pêre jî ji bo ku dîplomeyekî bi kêrî zehfî tiştan jî nayê bistînin

wê dînê îslamê li ser hisabên xwe bi erzanî bifiroşin. Mazereta wan jî amade ye:

*“Ger em bixebitin û di nava devletê de bigihîjin deverên giring û meqamên bilind da ku em wê çaxê bikaribin îslamê hakim bikin.”*

Bi van fort û zirtên hanê wê zulmê li nefsa xwe jî bikin û goya bi vê teqîyyeyê zen dikin ku bi can û bi malên xwe cîhadê dikin û xwe têxne xetereyeke pir mezin!

Li gorî qaîda *“La îlahe”* yê, gere her çuqas put û sanem û îlahên xûyayî an jî ên razber hebin, divê ku temaman ji nava heyatên xwe derxistana. Lê mixabin wiha nekirin. Xwe kirin lîstoka şeytanên insî, hewa û aqilê xwe xistin pêşîya wehîya îlahî. Gotin *“Em neçîn ser, em nebin mezin û serok, wê xwedênenas werin ser me!”*

Bi vê awayê jî, piştî hezar û çarsed û sih salan carekî din ji xwe re îlahên sexte çêkirin.

Alîkarîya Allah *azze we celle* nemuhîm dîtin û biçûk kirin û çîrokên ku xwe pê xapandin nivîsandin:

*“Heval, lazime ku muslîmên ve esrê dewlemend bin.”*

Xwe bi van çîrokên pûç xapandin heta ku ew jî ji nefsa xwe re bûn hogir û bi rêya helakê ve dest bi meşê kirin. Dawîyê de jî rabûn gotin:

*“Rîba jî weke danustendinê ye, di navbera wan de tu ferq tûne, ji xwe rîba helal e!”.*

Heyata eshab *radiyallahuanhum* bi derd û bi keder bû. Îşkence û sitemkarîyên ku Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* kişandiye bê hed û bê hisab e. Ha ev kesên ku şev û roj Qur’anê dixweynin û ji heyata Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* û eshabên wî *radiyallahuanhum* van qisetên îşkenceyê û mehrûmîyetê û zilm û zehmetîyê qiset dikin, bê sekin û bi qurretî wa’za dikin; dema ku ji bo xebat û xizmeta îslamê têkarbunek ji wan bê xwestin bersiva wan her dem li ser zimanê wan e:

*“Allah ferman dike:*

*“Xwe bi destên xwe navêjin talokê!”*

Vê ayetê li gorî dile xwe tewîl dikin û ji qada cîhadê firar dikin.

Wê bibejin *“Nimêja xwe bikin, zekata xwe bidin û rojîya xwe jî bigirin, lê nebe nebe hûn tevlî şixul û karên dewletê bibin! Lewre cihê dinyê cûda ye û cihê axîretê jî cûda ye!”*.

Bi vê gotinên hanê xwe dikin wekî Yahûdîya ku ew Yahûdî jî wiha dibêjin:

*“Hakimîyeta Allah li esmana ye!”*

Erê birayemin.

Wekî ku te jî fêm kirîye ev mijar ne mijara bitenê nimêj kirin û rojî girtina hinek mirovan e.

Mijar ev e ku, çawa kesê di nava nimêjê de hakimîyeta Allah *azze we celle* qebûl dike, divê di qada temamê jiyana xwe de jî vê hakimîyeta Allah *azze we celle* bi biryarî û bêkêmasî bi cih bîne.

Mijar ev e ku, çawa Allah *azze we celle* têkili îbadetê me dibe û bi me ferzkiriye weke vê mijarê emê bizanibin ku Allah *azze we celle* wê têkili sîstema dewletê jî bibe.

Îman anîna van mijara pêwîstekî/hewcetîyekî herî muhîm e. Di vê ku ev herdu mijar ji hev du cûda neyên dîtin. Lewre mirov di nava nimêjê

de çawa evdîtîyê dike, bi qedandina nimêjê abdîtîya wî naqede. Mal û perêyên tên qezenc kirin çawa bi ferzkirina zekâta wan Allah *azze we celle* xwedî raye/xwedî yetkî ye, têkili dadmendî û bazirganîyê jî dibe. Ev her du mijar jî ji hev du ne cûda ne. Divê em di van mijaran de her çi lazime wê bikin.

Tu fêm dikî ne wisan?

Allah *azze we celle* ji me re wiha ferman dike:

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُواْ اتَّقُواْ اللّهَ حَقَّ تُقَاتِهِ وَلاَ تَمُوتُنَّ إِلاَّ وَأَنتُم مُّسْلِمُونَ ﴿١٠٢﴾

*“Gelî ew ên îman anîne! Ji Allah, bi awayê layîqî wî ye, bitirsin û hew bi muslîmtî bimirin.”*

Eger her kes û her kom li gorî têr dîtina xwe pîvikan deyne, wê gavê îslam ji holê radibe û di şûnde dînekî din derdikeve. Lê navê wê dînê ne îslam e!

Lewre bi vê awayê serê mirovek û komek dînekî xeynî îslamê derdikeve meydanê. Ev dînên hanê nîvedîn e.

Mirovê ku got ez muslîm im, mecbur e wê

muslîmtîya xwe li gor îslamê pêk bîne û tetbîq bike û aqîdeya xwe sererast bi eşkerehî derxe meydanê! Weke wî gundîyê fenoke ku tirîyê xerabuyî û perçiqî xistîye binê zembîlê/selikê û serê wê jî bi tirîyê sincêrî dagirtiye, îslam bi nîvenîv nabe. Îslam ne dînekî kinêminê ye.

Ne li gorî min an jî li gorî te, li gorî îslamê!

Li gorî emr û daxwaza Allah *azze we celle*.

Daxwaza Allah *azze we celle* ne bawerîyekî ku di hinek mijaran de hakimîyeta wî hebe û di hinek mijaran de jî hakimîyet di destê xwedî hêz ên cûdahî de bin.

Hakimîyeta ku li temamê mijar û rastnavîya heyatê de carî ye.

Daxwaz û fermana Allah *azze we celle* ev e. Navê vê dawa hanê dawa ku cîhada yekemîn bi nefsê re, ya duyemîn jî bi taxutan re bê kirin e.

Di cîhada yekemîn de ji bo bawerîya tewhîdê bi biryarî û bê kêmasî di qelb de bi cih bibe mirov li ber xwe bide û vê aqîdeya tewhîdê li navenda mêjîyê xwe, li hûndirê rohê xwe û li ser dilê xwe neqiş bike wekî nexşên li ser lat û keviran.

Cîhada duyemîn jî ev e ku vê aqîdeya zelâl û bê gemmar bigihînin însanan û civakan û welatan.

Têkoşîna me têkoşîna desthilatdarîya/ hakimîyeta îslamê ye. Ew Îslama çawa ku ji Rasûlullah *aleyhîssalatûwesselam* re hatîye, weke wê îslamê zelal û eşkere û qewî û bi qêrina La îlahe îllallah Muhammedun Rasûlullah!

Belê têkoşîna me têkoşîna helaka taxutan e... Heta fitne li ser rûyê erdê tune bibe, înşaallah.

Birayêminê hêja!

Bi sebr û semax te guhdarîya min kir. Ji bo vê camêrîya te ez gelek spas li te dikim. Bi qasî ku zimanê min gerîya û bi gera qelema min ê li ser rûpelên vê pirtukê tiştê dizanîbûm min bi te re parve kir.

Êdî dor, dora te ye.

Vê pirtûkê nebe nebe bavêjî pişt guhê xwe!

Ku te vê pirtûkê da destê xwe hema lehzeyekî çav lê negerînî û navêjî quncekî. Xwendina vê pirtûkê ne ewiqîne û ne bêje:

*“Ez ê piştre bixwînim”*

Tu bizanibî dema ku ev pirtûk hate nivîsandin yek çerxiyek/quruşek jî ne hatiye xwestin. Çawa Pêxemberan *aleyhîmusselam* gotibûn, nivîskarê van rêzan jî bi wê nîyetê nivîsandiye:

يَا قَوْمِ لا أَسْأَلُكُمْ عَلَيْهِ أَجْرًا إِنْ أَجْرِيَ إِلاَّ عَلَى الَّذِي فَطَرَنِي...

*“Gelî qewmê min! Ez ji ber vêya ve, ji we qet heqekî naxwazim, xelata min li ser (Allah) e ku wî ez xuliqandime...”*

Ji te, tenê bitenê ev tê xwestin. Ji bo xatirê qelema ku vê pirtûkê nivîsandîye tu jî vê pirtûkê bi baldarî bixweynî û fêm bikî. Piştî xwendin û fêmkirinê jî çi lazim be di kirinê de qet texsîr neke û kêm nemîne.

Heke tu dixwazî heqekî bidî min, ew heq ev e ku, tu taxutan red bikî û ji wan biqehirî...

Biqehrekî îmanî!

Ji heq û ji ehlê heqqê re dildar û dilevîn be.

Ji muwahhîdan re dilgerm û dilronî be.

Tu, hevoka *“La îlahe îllallah Muhammedun*

*Rasûlullah”* qenc fêm bike.

Bi vê femkirin û zanîna xwe bi îxlas amel bike.

Jiyana xwe bike şahidê aqîda xwe.

Aqîda xwe bidilsozî û bicanfidaî biparêze.

Meşa te ya li ser rêya tewhîdê pîroz be!

Her lehzeya te ya li ser vê rêyê Allah *azze we celle* alîkarê te be!

Allah *azze we celle* te bi nûr û qencîya xwe ronî bike.

Bimîne di nav xêr û xweşiyê de...

Hemd û pesindanên herî xweşik bitenê ji Allah re ye...

***12 Sibat 2019***

***Êlih***

## FERHENGOK

**Amade:** Eleste, eywez, hazır (olmak, bulunmak)

**Armanc:** Meqset, xaye, mirad

**Asteng:** Berbest, bendek, manîa, gangaz, feşk

**Baldar:** Bidîqat, dêhndar

**Balkêş:** Serînekêş, seyr, helez

**Bav:** Bab, baba

**Berpirsîyar:** Mesul, karbidest, berpirs

**Binbar:** Mûkellef, stûbar, lixwegirtî

**Bi kurtahî:** Bi kurtî, bi kinasî (xulaseya metnekî), özetle

**Bûyer:** Hedîse, qewam, kıssa, qewmîn, teşqele, olay

**Bertek:** Reaksiyon, vebizav

**Cejn:** Î'yd, (roja pîrozbahî)

**Cihû:** Yahudî, cihûd.

**Civak:** Komal, toplum

**Cuda:** Cihê, cihêwaz, têvel, cidayî, eksentrik.

**Cur:** Çeşîd, celeb, texlîd, teşîd.

**Çavkani:** Serkanî, jêderk, kaynak, mehaz, bibliyografi, kaynakça

**Dibistan:** Xwendegeh, mektep, dabistan

**Diyar:** Xuya, belî

**Diyarkirî:** îzahkirî, açıklanmış, belirlenmiş

**Dij:** Hember, dijber, muxalif, pêşber, raber

**Desthilatî:** Hakimîyet, desthilatdarî, karîn, otorite.

**Êş:** Jan, bela, mihnet, zehmetî.

**Endam:** Aza

**Ferman:** Buyruk

**Fermî:** Resmî (tiştê der barê dewletê)

**Filleh:** Xiristîyan, Îsewî

**Giştewar:** Berfireh, somdar, bergehdar

**Gel:** Xelk, millet

**Herî:** Çamur

**Hesteweri:** Hestyarî, pêjnkerî, bihîzyarî, xemxurî.

**Heyînî:** Hebûn, mewcûdiyet, heyber, heyîn.

**Hez:** Evîn, viyan, dilîn, muhabbet, sevgi

**Hêlin:** Lan, hêçik, yuva

**Hêman:** Unsur, reqez

**Hêz:** Quwet, xurtî, qewet

**Hêsan:** Rihet, Sehl, asân

**Hilbijartin:** Întîxab, neqandinê, seçim

**Hûrgilî:** Teferûat, tefsilat, detay

**Îro:** Bugün

**Kal:** Bapîr, ata, dede

**Kevneşop:** Adet, gerdiş, (rêbazên ji bav û kalan maye), anane, gelenek,

**Kevnoşopî:** Geleneksel, atadan- dededen kalma, ananevî

**Karger:** Îdareker, rêveber, idareci

**Mixabin:** Çi heyf (Di maneya ber ketin û xemgînîye de)

**Malbat:** Xêzan, aile

**Mijar:** Mesele, konu, mevzu

**Mînak:** Mîsal, nimûne

**Navbeynkar:** Aracı

**Nexwe:** Heke na, Maxvene, erkena, demek/demek ki

**Pel:** Pelçim, sahîfe, belg

**Peyv:** Bêje, kelime, wûşe

**Ol/Oldar:** Dîn/Dîndar

**Parseng:** Teraz, denke, denge, bandeke

**Paxav:** Guhnedarî, bêxîretî, kulak asmamak

**Perwerde:** Talîm, hêvotin, perwerdehî, fêrdarî, eğitim

**Pergal:** Sîstem, sazûman, serûberî, azîn

**Pêşnîyar:** Pêşnîyaz, tewqe, teklif

**Peyker:** Put, büst, heykel

**Pêlihevanîn:** Ayak uydurmak

**Pêşgotin:** Önsöz

**Pêşek:** (ji bo berheman) Teqdîm

**Pêwist:** Hewce, divê, gerek, pêdîvî, lüzum, icab

**Peyman:** Ahd, ahîd, söz

**Peyv:** Kelime, sözcük

**Rewş:** Weziyet, durum, hal

**Rewşen:** Ronî, ronahî, ronak

**Rêbaz:** Metod, azîn, menhec

**Rêwişt:** Sinc, exlaq, wefir, reftar, ahlak, töre

**Razber:** Nedîtbar, nenêrber, neberbiçav, xwadar, kitut, soyut

**Raman:** Fikr, hizir, fêm, ramîyar, görüş, düşünce

**Rêşaşî:** Sapkınlık

**Rêwindayî:** Hêçbun, harbûn, bitir bûn, azmak/azgınlaşmak

**Rêxistin:** Sazî, rêkiraw, örgüt, organizasyon

**Rayedar:** Destûrmend, karbidest, yetkili/ yönetici

**Rayeya Qanundanînê:** Yetkîya zagonsazîyê, Yasama yetkisi, (kanun yapma yetkisi)

**Rêveber:** Kargêr, bergêr, doliwgerî, gerinde, îdarecî

**Rumêt:** Rêz, hûrmet, giram, şeref, değer, onur, şeref, saygı

**Quretî:** Mezinayî, pozbilindî, kuşpenetî, fêz, pirnax

**Sazî:** Damezirak, dukêl, mezringeh, kurum, kuruluş

**Sedem:** Sebeb, bone, hoy, ûşt

**Sond:** Qesem, diramentî, yemîn

**Senem:** Pût, fetîş

**Teqez:** Mutleq, qethî, mîsoger, vebir, muheqqeq, kesîn

**Teretûr:** Hezeyan, safsata, tewş, tiroviro, tewşomewşo

**Taybetî:** Nemaze, xusûsîyet, gewşîn, rûçik, özellik

**Wek:** Olarak (Mîsal: wek îlah=ilah olarak)

**Wate:** Mane, mehne, anlam

**Xelasî:** Kurtuluş, kurtulma

**Xetere:** Talûke, metirsî, bizdinok, kuşariş, hereşe, tehlike

**Xweşewist/Xoşewîst:** Sevgili, aziz

**Zayend/Zadegan:** Esîl (kesên ku ji maleke esîl e), soylu

BIRAYÊMIN!

Xelkê me Qur'ana di malên xwe de têxin hewleqên neqişkirî û yên herîs xweşik. Qur'ana xwe di nav xanîyên xwe de li cihêkî herî bilind digirin.

Lê ew Qur'an ji hewleqan dernakeve û nakeve jiyana kesanî û ya malbatî û ya civakî û ew Qur'an ji ser dolav û dîwarên bilind berjêr nabe û nakeve odeyên mê û kolanên mê û sûkên me û kargehên me û dikanên

Çimkî ew kes, wan ayetên ku taxuta red dike dixwînin, lê xwe ji wan taxutan dûr nakin. Carinan dibin xulam û qerwaşên taxutan, carinan jî ew bixwe dibin taxut!

ISBN 978-605-68965-4-5

9 786056 896545